


MEDENİ FERHO

BERANÊ KOZÎ



ABeCe çîrok

medeni ferho
BERANÊ KOZÎ

weşanên ABeCe
ABeCe/yayınları

weşanên ABeCe : 2
rêza çîroka : 1

Çap 1993
Adres : Brusselsesteenweg, 638
1731 Zellik (Asse)
BELÇIKA

MEDENÎ FERHO

**beranê
kozi**

çirok

Pirtukên medenî ferho:

- | | | |
|-------------|--------------------|--------------------------|
| Bi Tirkî | : Toprağın Türküsü | - <i>helbest</i> |
| | Kaytan Osman | - <i>çîrok bo zaroka</i> |
| | Mapusluk Gerçeğim | - <i>helbest</i> |
| | Yaşam Tutsak | - <i>romana tadeyî</i> |
| | Ben Tûtsak | <i>û perçiqandinê</i> |
| Bi Kurdî | : Beranê Kozî | - <i>çîroka dirêj</i> |
| Bi Holendî: | Lied Der Aarde | - <i>helbest</i> |

*Rifatê Kozi,
Mihemed Seidê Kozi,
jîyana xwe bi rumet û
pîrozî derbas kir in.
Bun dabaşa çiroka me,
bo, Jîyaneke serfirazî
û mînak...
cihê wan bihişt e.*

-Çîrok, di jîyana rojê de di jî.

meriv bi her kesî re nikare bi keve
sergovanda jîyanê û desmalê bi hejîne;
kû ne kesên ji keda xwe têr nan be,
ji sifra xwe re xweş ciwamêr û dil rehman be,
û aqilmendê dûr meyzên be...

Huseynê FERHO

çend gotin

Çîrok jîyan e!...

Jiyana rast û rê, berdewam e.

Di jî... Bi sala û wext re di meşe.

Tevgera xilmeta pîrr kes û serdoran di nava avanî ya wê de tune ye. Dûr û fere, xilmet û tevgerê na ke. Kin, qut, lê, rast di meşe. Tevgera komelayetî, dîrokî, şexsî di nava xerca xwe de nişan dide. Gazin, lom tê derbas dibin. Lept/heraket, psîkolojîya insan, tevger jîyan xerca wê ye. Nivîskar hoste ye. Rewşa nivîsandina çîrokê bi çend lewna tê nasîn. Lê pîrranî, bi diduwan xwe da ye pêş. Mizahî, mizahî ya reş û normal... Normal: kin û dirêj ferq na ke. Bes lêkirina avanî ya wê gere rast û rê bit, bê tevgera cûde cûde be. Eve kû, çîrok û romanê ji hev di veqetîne.

Çîrok, di tevgera jîyanê de, exlebe li ser jiyana rojê disekine. Pêl û şax na berde ser kûraya tevgerê. Bi wext û rojê re gav tavêje. Lê hewn û hewngîrî ya rabun û runîştinê, lept û dîtina insan dide ber himbêza xwe. Navê vê rewşa nivîsandinê, bo van sedemê bu ye **çîrok**. Ne mesele!... Ne roman!... **ÇIROK**... Lêkirina **Bêranê Kozî** ji eve. Çîrok e. Jiyana hêla Kurdên Torê ye. Sedemê bi şax û per dide. Jiyana qedexe kirî ye... Sedemê bi fereyî lê dixê. Di rewşa avaniya çîrokî de. Dirêj nabe sedema kû bi lewnekî din bê binav kirin. Agahdarî ya vekirî, agahdarî ya neqşî, serflrazî, da ye ber himbêza xwe. Armanc eve.

Rewşa nivîsandina min eve. Ne mîzahî ya reş e. Fere ye!... Dîtina min, kûr û dûr lê dixê. nerîna min, li dinyayê, li jîyanê, li însanî; di navbera nivîsandina minde, ne hunda ye. Xwe nîşan dide. Ne bi tozîk, di bin cilikê de, ne di nava gotin û xeberan de, eşkere!... Û car cara bi vege/tekrar e... Ez, divim kû, dîtina min, rast û rê; bals û lom, finasên dinyayê, direkt herin ber xwendevan. Zimanê Kurdî kevnare ye. Di nava kavilê dîroka dinyayê de, cihekî girîng digire. Lê mixabîn, çend sedsal in, kû, ji alî nivîsandinê ve, ji alî dîrokê ve, ji alî jîyanê ve, kavil jî; bi destê kedxwer û kevnepereştan tê hunda kirin. Qedexekirin ne bes bû, hunda kirin, bû ye armanc ji dijmin re. Ê gelên dinyayê, bi kolan û xepartin tê wejartin, bi dil şahî der tê ronahîyê. Ê Kurda, mixabîn, ax bi ser de tê dakirin; av bi ser de tê xurandin; toz, gemar bi ser de tê valakirin. Bo, bi carekê hunda bibe. Bo, qenc û xweş gom bibe. Bingeha hebuna Kurda, huner û qedirşinasên wan, aqilmendê wan qet jîyan ne binîn.

Jîyan bi tevayî qedexe ye.

Bo vê sedemê, nivîsandin ketîye deva de. Bû ye gotin... Şer, dîlok, metelok, meselok, helbest, çîrok, dîrok, qewl, qesîde... Teva!... Ew tiştên kû bi **epfk, lîrk**, tên bi nav kirin. **Epopên** Kurdan bi carekê...

Weja bi devkî...

Jîyana rengîn û xemgîn...

Xwe li hêla folklorê da ye xwîya kirin.

Di hereket û gotina de, di jîyana rengîn de xwe pêça ye. hatî hunandin. Di warê folklorê de xwe pêşyênarî kirîye. Serfirazî ya xwe, berxwedan a xwe, hebun û jîyana xwe, di vir de li ser pîya da ye sekinandin.

Jîyana xuzeyî...

Kurdî ne hatî ye xilmetkirin. Ji hêla nivîsandinê ve. Exlebe!... Çend saleke kû tê xilmetkirin; ew jî, li welatên xerîbîyê; ne di nava gel de bikar tê. Pirtukên çap dibin, qet na gihijîne nava gel. Pîrr kesên hêja karê nivîsandinê dikin. Xebateke hêja, bi keda mezin. Berhemên hêja derdixîne meydanê. Lê, çi fêde!... Mixabîn kû di nava serdorên xwe de minîn.

Ziman xweşe, xilmeta ziman xweşe di nava gel de, bi tevgera gel re. Bo, jîyan û ziman ji hev cûde ne be. Dive kû, xebata me ne bê salifa dikana Qaso!...

Nivîskar durî gelê xwe ye. Sedem ev e. Mîna masiyê di bejê de ye. Qırram jî tune ye. Kû, qırram tune be, jîyan zor e. Masî di nava qumê de nikare sobayî ye bike, insan jî di nava ummanê de nikarê tim, li ser piyê xwe bi sekine. Em teva bo gelê xwe di nivîsîn. Ne tenê bo belge û wesaikên çarzemana re. Dive, gel hîni zimanê xwe, fêrî xwendina xwe bibe. Bê gotin, nivîskar herin nava gel... Gelên xwe, bi huner û berhemên xwe, serbilind û dilqewîn bikin.

Masî di nava avê de...

Dar di nava axê de...

Nivîskar di nava gelê xwe de...

Dikare jîyana bi rumet bike.

Bi çi lewnê kû hebe, dive berhemên hunermendê Kurda bigihijîne nava gelên Kurd.

Rewşa îro ne wisa ye. Pêl û lewn qulbîn. Daxawaza hemdemî xwe wisa nişan dide kû em nivîskarên Kurd, pêwistî bersiva gel in. Berpirsîyarî ketî ye ser milên hunermenda. Dive kû ev bar bê hilgirtin. Îro, girtin, kuştin hebe jî, rewş ketîye nîrê zêrîn de. Erê, ne xweş e. Lê dive kû em zorê bidin, bo, xweş bunê. Jîyan ber bi pêş xilmet dide; em nikarin li gor jîyanê bezûlez ne kin. Keftûleft li gor jîyanê gere ye. Kurd, gihane merhaleyekê. Veger, dapaş tune ye. Ji her alî de... Çandî, edebî, politik...

Dive kû, em nivîskarên Kurda ligor tevgera dinyayê; ji hindîkayî ve, li gor rêxistinên Kurda, kû şerê sar û germ, a netewî dibe, jîyanê bi rumet dikin, cî bigirin. Cihêkî bingeh essehî, sexlemî, dawî gere li pêşîya tevgera sîyasî bêt girtin.

Medenî FERHO

Nîvê şevê ye. Heyv zû de çu ye ava. Reştarîkê girtibu ser ruwê erdê. Telîyan di çavê hev rak e, kes kesî na bîne. Dinya xweş e. Beharê destê xwe da ye havînî... Behara rengî... Bêhn û xêrî, mîzgînî ya şîn û şahî, ya nûbunê... Jîyan deng dide. Dengê zêdebunê... Bangdana şiyarbûnê... Giraniya zivistanî, sistbuna ber soba, tifika, ji ser milê însanî xwe dide alî. Lepta berxwedanê ye. Dendika jîyanê di pijkive. Xêr e, bereket e, zêdebun e... Havîna gewr bû, mijulîya salewext... Bavê fiqrûfeqîra; wextê sebebê, bo abora salê, kîmkîma karûbar e. Sal jî xweş bûrî bû. Deşta Nisêbinê, wekî her car bereketa xwe hêlî dinyayê kiribu. Li gor felalîha, cotkar û gundî ya, tov, çil û hin wê bavêjê. Ruwê kesê xwedî cotûbar di kenîya. Lê, binya Bagokê, ji ber Gurînê heya dehma Kertwênê, bi alî Cizîrê de... Şuv, teva hatibûn hilkirin. Reng, sor purxulî bû. Terektora, wan roja cot xelaskiribun. Rawa erdê xweş xwîya dikir. Tava rojê tilmikê ser ruwê erdê ziwa kiribu. Şuv bo meşa şevê xweş bû. Qeselek, bo dermana, kû peyda bibe, ne qabil bû. Qet!... Ji ber lingê însana xişpênîk ne di hat. Şewlekî rast, bê tilmik, mîna merşeke raxistî, duvdîrêj. Sê sedê qantira jî, xişpênîk hatiba ye, di hata hiskirin. Birrek zilam û jin... Çikçikandî, ji xof û tirsê romî ya dilê wan çar

kopal lê dida. Bi lezeke tirsê, gavên kûlmilî, xwe li hev di dane hevdin, li bayê bazê di meşîn. Kom dibun, rêz dibun... Hin lez dikirin, hin xwe li hev didane hev. Çavê tirsê ye. Kesê kû ma li paş, çu... Xwedê ji dayika wîn sitand. Ma li çolan; deng bike xetere... Romî ne, mirin e... Deng neke li çol û çîya man û bê xwedîtî ye. Du tirsê, da bû pey wan. Yek: Tirsê romî ya bû, a din, tirsê mayin a li çol û çîya û xerîbîyê. Ya sisîya jî hebu; tirsê herî mezin; ji hevala qetandin, mana li paş, ne ghiştina Bêrudê... Bê karûbarî ye; sala kû be, birçîbûn û şepirzebûn e... Ne meş bû, bi rê ve çuna wan, bez bû. Beza ji ber mirinê bû. Beza aborîyê bû. Hawar bû... Jîyana zorê... Jîyana bi destê kedxweran hatî qedexe kirin... Jîyana bi xwe deste îcar. Benî beşer ne bes ebdê sucudê ye. Ne bes ê ser tewandinê ye. Xwedî ked û xulqete. Xwedî serhildan û berxwedan e. Rojê qewamê berxwedana mezin dide nîşan. Bo abora rojê, ya salê; ji bin erdê, ji ser ruwê erdê di xuliqînê. Zor û mecburî dizanê. Kû hate ser ya talî, xulqet jî, ji destê însanî xelas na be. Xulqet bingeha jîyanê ye.

Ne mijulîya dinyayê xelas dibe, ne karê dinyayê!...

Roja kû însanî rabû ser lingê xwe; dest û hewnê xwe bi hev re xilmet kirin, dest bi xulqeta hewceyî ya xwe kirîye. Mecal û mefer di bîne. Bi xwe çê dike, datîne meydanê. Li xwe, demeke duvdirêj, ne ma ye heyirî. Qet!...

Bi vî şikl û teşliha hawarî, di şewlê binya Kertwênê re, ber bi hidud di çûn. Tirs mezin bû. Hidudê bi mayin bû. Esker bû, tim di gerîya. Jeepa eskerîyê tim oxilme dikir. Piştî şîva, kû reş kete erdê, sekin û tebatî ne dikete

rihûcanê xopanê, malxirabê zabita de... Heya sibehî, ji vî serî hidud heya bi serê din, di gerîyan. Rêyeke bi xeter e. Bi devê tivinga romî ya kuştin; di nava mayîna de parçebûn heye. Ya herî mezin, ya kû qet û ticcar neyê hed kirin, nayê xwarin, nayê qurpandin bêbextî ya xayîna heye. Temayî ya dinyayê... Temayî û bêbextî... Du xeberê yek weznê ne. Ji hev nayên veqetandin. Eve, kû dibêjin temayî ji gû pîstire; lê bêbextî jê gemartir û mekrohtire. Qet hed nabe...

Navê bêbextîyê kotî tî ye.

Ev kotî tî, ticcar û wext, ji nava xopana berîya binya Bagokê xilas ne bû ye. Na be jî... Ji dema Haco vir de. Sal 1890 û vir de... Zede bû. Bu kar bo kurê netkesa... Bêbextî buye nexweşî û ketiye laşê însanî de. Dijmin, tovê xîyanetê, pêşî avête nava axê; lê axê bê xîretî qebl ne kir. Xîyanet çû nava gelî û çîya; zûrên bi gelî û çîya ket, qebl ne kir... Kotî tî, bêhn û bixara çepelîyê ye, pîsîtiya xwelî li ser e. Xîyanetê, xwe hilda ser kuç û lata; kuç û lat, ji hev herhilîn,; parpitîn, qebl nekir in. Çepelî, kotî tî, xwelî liserî ma barê însana... Însanê xwelî li ser... Dijminê dijwar, kedxwer, xîyanet kire xwîna Kurda, ew kesê netkesa... Ji Nizamulmûlk û Selçukê Mongolî û vir de... Zor û zahmetî!.. Xwîn, tadeyî!.. Kûl û merez... Zikreşî û bêbextî!.. Jîyanekê têr gemarî... Hê jî berdewama. Sed, sed û pêncî sal di navbera wê re burî ye jî, bêbextîya çepelan, neciwamêriya lûtçî û gidîyan, mîna roja pêşî li dar e. Bi romî ya re, di kozik û kemîna de, li serê çî ya, di taqîbata dûr û kûr de; li ber qaçaxçîyan, li ber walatpareza, li ber fiqrûfeqîran; kû bo abora salê, diçine binya xetê kar dîkin, veketî ne. Ne dizanin eybûarî çî ye, ne dizanin

şerm û şermezarî çî ye.

Telaqreşî ne bi pera ye.

Li hêla Torê, van kesê xayin û muxbir: "Bêjyê ber çîtîk û têla" bi nav dikin. Çîtîk li ber avê çê dibin. Têl jî, Kurdistanê jêrîn, seranser kirîye du şiq. Pêşî û paşî mayîn gav li gava din raxistîne. Xefkê mirinê dane milê hevandin. Têlê têr dirih û li hev badayî; lod li pey loda din, teva bi heve girêdayî duvdirêjî hev dibin.

X X

X

Berî pazde sala, wekî îşev...

Dise, şevtarîke wilo bû. Ev wextê salê bû. Pêlê reşa êvarê havînî mul dabune hevandin. Rifatê Kozî û birayê xwe Mihemed Seîd, sê hesp û di qantirê mîna di qedena bar kirî, dabune pêşîya xwe... Piştî xwe dabune oxirê, berê xwe dabune felekê. Felek xayînê!.. Şev xweşe. Tarî ye. Têhnik ba jî na lebitê. Pelê dara na hejin. Çuqliyên kulîlka, geyê na lebitîn. Şeveke sekinî, pêl dayî, nerm û giran. Bo qaçaxçîyan, şevên wisa, reştarî başin. Star e... Îşev jî, şeva qaçaxçîya ye. Tarî ye. Her du bira, hîn xort in. Ji xwe qayil in. Demûdewrana wan e. Di kemla xwe de ne. Roja kû bîrewer bune, jîyana zorê dane ber himbêza xwe. Nanê xwe ji devê gura, bi devê tivinga xwe derdixin. Bêxîretî qebl nekirine. Çavê xwe ne berdane deriyê xelkê... Çavê xwe ne berdane lutê xelkê... Bi keda xwe, bi xwîna xwe nan xwarine. Çavê xwe vekirine, xwe di nava vî karî de dîtîne. Gundê wan, li

quna çiyakî ye... Jîyan zor e. Çîya bê xêr e. Jîyan na de. Mefere danûsitandina qelsî, abora destlepkê ye. Wan, ev jîyan qebl nekir... Bo nanê rojê bez nekir. Jîyana zorê, nanê bi hil û mil dan ber himbêza xwe. Bavê wan ev şîret li wan kir: Roja kû serê xwe danî, çû heqîya xwedê, bakire her du kurê xwe, şîreta dawî li wan kir: "Binerlawo, demûdewran a we, ne ya tirşûtalane ye, walat di bin destê dijminekî harhare de ye; nan di devê gur de ye, dinya fere ye, xîzna Hu dagirtî ye, mêrî çê bin dest hilînin. Emanet, destê xwe medin dijmin, pê re tifaqîyê mekin. Tifaqî ya bi dijmin re, xîyanetê bi xwer tîne. Emanet!... Şîreta diduwan: Tifaqî!.. Berî her tiştî, di tifaqa hev de bin. Kû hûn, li piştta hev bin, dinya teva nikarê bi we. Çawa hebe, parîk nan e; parîk kêr, yek zê de... Lê jîyan bi kotîtî û çepelî bila ne bara wê bit." Ji roja kû bavê wan çu rahmetê heya niha, berê wan li oxirê ye, piştta wan li felekê ye. Nanê xwe jî, bi xwîna xwe dixwun. Keda wan jî helale. Keda helal bereketa Xelîl Birahîm e. Têr û tişe ne. Qet, cot û bar ne kirin. Barê tirş jî zor e. Şivantî, rebenî ya sal û miha lazim e. Lez û beza şev û rojê... Qîma xwe bi wê jî nanîn.

Ev kar!... Ev bar!... Ev lebt!... Rê ya çun û ne hatinê ye. Ji vir ve mirin çavê xwe beloq dike, ji wir ve melkemot çavê xwe beloq dike. Tîrêjê berqa tayê mirinê, li rîya kû pê de di çin di barin. Tim!... Çarqerqa tavê mirinê, şerqerqa bruskê mirinê di rîya wan de dibarin. Dav in. Birê bê binî ne... Newalê kûr û têr hefrît û hûtên çil serî ne. Mayîn û têlê têr dirih in. Reşaşe û tivingê romî ya ne.

Qederê tor a xwe wisa huna bû. Bo her du bira... Ji zaroktî heya îro, çûn û hatina wan di ser pira salatê re

bû. Ji mû ziravtir, ji şûr tujtir. Li rexê Torê, melke-
mot, romî ye, mayîn û têlê bi dirî ne; li rexê berî ya
cerihê, derekê Ereba ne. Rahma Hû, di dilê her sîyan de
jî tune. Ne dizanin xatir çî ye, ne dizanin neçarî û aborî
çîye... Ne dizanin debor çî ye, ne dizanin zarok, pîr û
kal çî ye...

Wekî îşev, li miqambilê Qetranîyê bûn.

Rêzanê wan Cangîrê Huto bû. Ji gundê Serkahnî... Meri-
vekî bê xelat û çepel bû; gundiya berdabûyê. Mala xwe
biribu Nisêbînê û dest bi vî karî kir. Karê rêzantîyê... Jir
û zîrek bû. Heya îro kesî hîle û şaşî li dor ne dibu. Çe-
peliya wîn di mala wîn de bû, di jîyana wîn de bû!.. Ri-
fatê Kozî, roja kû çû cem û rêzantiya wî xwest, şehitî û
barê xwe got. Xeyn ji titinê, çar kilo zêr jî hebun. Te-
mayî ya dinyayê pîse. Lewate, gemare... Qewlê xwe da-
nin, nokta xwe jî nişan kirin. Rifat heqqê wî jî li ser
cilê, kêlîka qewl birin dayê. Merivekî feqîr bû. Mala wî,
jin û zarokê wî şepirze bun. Dilê Rifat bi wan şewitî. Di
karê wisa de, pere xwedî gotin in. Rifat ev sedem xweş
dizanîbû. Tema kir... Derewa hinek pere din jê re kir.
Kû bi silametî derbasbun, li veqerê hinek perê din wê
bidayê. Cangîr jî, dil şa bû, qayil bû. Zirt û bi xweşî
gotin kirin. Ew roj hat. Îşev e... Her du bira wekî di
gura, li pey hesp û qentirê xwe di meşin. Yek li pêş,
yek jî li paş. Li xwe êmin in. Ji hev xof nakin. Bira ne,
ji ser hev baz nadin. Dilşawêtê hev in. Tirs û xof ne li
bîra wan e. Şazî barno, mîna darê tanurê di destê wan
de; bi rextê dagirtî pêçayî... Bi lezeke hawarî di meşin. Hindik
ji civanê wan re ma bû. Çavik ji wan li pêşî ya wan bû, ê
din li noqta qawlê wan... Bo nişanî ya Cangîr... Qewlê
wan ev bu: Cangîr wî li noqta romî ya be, kû kilomet-

rek ma di navbera wan de, wî çeqmeq pêxe û bi mirî-
ne. Piştir pênsed metroyî wî kuxê û dengê xwe bike.
Ber êvarî jî hevdi dîtîn. Her tişt li rê bû.

Rifatê Kozî çixarek da Cangîr û got:

-Xelas ne wisa? Em îşev di meşin. Tu karî, ji alî romî
ya ve, tu nexweşî tune?

Cangîr, çixara xwe pêxist. Çixare di devê wî de bersiv da:
-Qet xeyala mekin. Ez hazirim. Min romî jî dîtîn û bavê
romî ya jî...

Wilo bu.

Rast bu.

Romî jî dîtibun. Lê çawa?...

Berî kîlometrekê çeqmeq pê ket. Rifat, li pêş bû. Hevsa-
rê hespê boz di destê wî de bû. Niqutî dilê wî. Ji xwe
re: "Ev segbav, bêbextîyê li me bike, temayî ya dinyayê
ye, min qala zêra jî jêr kir..." Xwe da milê rastê. Hesp
kete buwara wîn û noqtê de. Çi dibe çi na be! Hê ew di
fikirî, çeqmeq pê ket û mir. Rifat di ber xwe de: "Ev
yek!..."? Meşîyan... Gihan cihê din, kuxtêna Cangîr ne
hat. Ji noqtê ne rabu... Ber bi wan jî ne hat. Mademekî
romî dîtibun, tirsawî ji çîye? Bila rabe, kû romî li noq-
tê bin, bila tivingê wan bîne... Kû romî ne li wir bin,
xwa îş sehle. Ka, li kû ma? Ne deng û hisên? Sekinî...
Dilê wî car din xera bû. Di ber xwe de: "Çeqmeq pê
ket, kuxtên ne hat, ew jî xuya nake. Ti pêjin tune.
Çima gelo?.." Di wê kêlikê de, kuxtêna Cangîr hat. Rifat
kir kû xwe bidê pêş, bû teqreqa silma; pêre pêre, sê
tiving li pey hev teqîyan.

Teq, teq, teq!...

-Dur ulen, kıpırdama!....

-Dur ulan kaçmayın!...

-Dur ulan vururum!...

Xurên bi tariya şevê ket. Hespê di destê Rifat de, bi ser her dû lingê pêş de xummeha. Her çar kîloyê zêr, bi qarîşekê li ser barê hespê boz girêdayî bûn. Rifat, li ber hesp kab berda erdê û zirt kirin. Bi zirtê xwe re jî sixêf kirin. Berê şazî barno da wan, nemerdî nekir, li ser wan danî. Şewteka baş li wan kir. Ne hişt kû sewtên bikevê wan de. Heya kû kekê wî her çar heywanê dî dûr xistin ji cih ne lebitî û agir qut nekir. Bû mijik û moran li ser serê wan. Car din dengê xwe kir û şewteke dî, xweş, li ser wan danî.

-Lawê Cangîr, Ti bêjîyê ber têl û çîtîkayî, mêr bêbextî ya bi mêranî dike, ne wekî te bi destê neyarê romî ya. Lê xwedê dizanê kû ewê cem te, li dayîka te suwar bune. Lawo ma te nav û dengê Rifatê Kozi hisnekiribû kû ti bêbextîyê lê bike. Lawê tîrrê, tu mi nasdike; kû ez kurê bavêxwe bim, ez nema dihêlim kû tu nanê tenurê bişikîne, kû ez kurê te bim, ji xwe teyî derba xwe li min da ye. Qet xeyala meke, ez Rifat im... Beranê Kozi, ez gurê rojê halo me; ez çar kîlo zêr jî, ji ter nahêlim û te minet tê ne hişt, kar û bara xwe bike. Ji niha û ne dûr. Tê bikevê bin axa sar, tê bibe mêhvanê mişk û mara...

Ji aliyê din ve, Mihemed Seid berê heywana da Bagokê, li ser linga, şipê, berê şazî berno da wan û li ser wan danî. Bi dengê fişeka pêşî re dengê xwe kir:

-Bo bo bo!.. Ez Kozî me, birayê Rifatê çav reşim... Îro roja qewamê ye, ha bavê kê dest hilê ez li pişta te me. Xwedê zanê kû xilasî ya bextreşê Cangîr û kedxwerê romî ya qet û ticcar ji destê min tunîne.

Her du bira, wekî di gura, gih di zurîn, gih di kelîn û di gotin. Sekin ne bi wan diket, ne bi tivingê wan... Mîna kewê ribat, li şer fersîk di xwendin û di reşandin. Deng û wistênî bi romî ya ne ket. Dengê tivinga, bi carekê hat birîn.

Rifat dengê xwe li Kekê xwe kir:

-Heywana tenê me hêle, ez birakê te me, ne ev qun bi riqayê hana, alayî ya Mêrdînê bi ser min de bi xurê, xof na kevê dilê min de, here, xwîna me û xelkê li ser pişta wan heywana ye. Ji ber bêjîyê wekî Cangîro ne heyf û mixabin e, kû em her du runin. Da zanibe mêr li dinyayê hene.

Şun zirtê xwe re şawteke dinî xweş li ser wan danî. Piştir rabu, rahişte turê zêr, du cara destê xwe li serê hespê boz da, xwe tewand û di nava reşa êvarî de hunda bû.

Bagok diya mirada ye. Cihê mehkûm û qaçaqçiya ye. Qunaxa rev û bazdanê ye. Cihê kom û nijda ye. Civanê mêr û mêrxasa ye. Kû lingê kurebava kete nava lat û kevirê Bagokê, ne bextreş dikarin li duv wan herin, ne kedxwerê romî ya. Bê gotin!... Bagok bi top û metrelyoza nayê safikirin.

Li quna çiyê, Rifat giha kekê xwe. Gurîn xelas kirin, berê xwe dana serê girê Bagokê. Ji hev re qal ne kirin,

lê di dilê her duwan de jî, qista mala Sebrîyê Ferîda he-
bu. Şêrê Bagokê... Mala mêhvana... Sitara dost û rêwin-
gîyê ji derb ketî. Sabrî, bi navê dîya xwe dihat bakirin,
lê merivekî li bavê xwe zêde kiriye. Weke kû paqrutê
Ereba dibêjin: Ebuzêdan e... Lê, li fetlînoka lata qelaştî,
Rifat, li pêşîya heywana zivîrî. Parîkî bêhna xwe berdan.
Hedanî qet na kevê canê wî. Sebra wî nayê. Rîya wîn di
nava cilê wîn de ne ma ye. Xwêhdaneke hurik û cemidî
bi laşê wî diket. Kû xofa xwedê ne ketibana dilê wî, a
niha wî bigirê ser mala Cangîr, zarokê wî, jina wî teva
dê ber devê tivingê. Xanî jî şewitênê û çê nivê suka Nisêbînê
bang bide, da segbavekî din bêbextî li tu ciwamêrê din
nekiriba ye. Firnikê bêhvilê wî fereh dibin, di furî, di
kelî, dibe kufkufa wî... Di binê latê de tebata wî nayê.
Reşayî, hêdî hêdî xwe dide alî. Cihê xwe ji ronahîyê...

Mihamed Seid dêhnê xwe dayê kû hêrzê wî hatinê; roj li
nivro wê xwe berdê nava bajarê Nisêbînê.

-Ka runê birayê min, bêhna xwe ber de. Segbava çiq di
me ne kir in...

Rifat, awirê xwe ji Nisêbîne qut ne kir. Rayê pê çavê wî
mîna telîyê desta gir bu bun.

-Vî segbavî çima bêbextî li me kir? Îro divê kû ez xwe
bigihênime wî. Divê, ev xayîn be hunda kirin. Kesî qala
wî û bêbextîyê, heya îro ne kiribu... Çima wilo kir? Ji
îro pê de, rê ya vî segbavî bu xiyamet. Wê mala gelek
kurê ciwamêra xera bike. Em kûştin, lê xwedê em xelas
kirin. Dive jê re ne mîne.

Mihamed Seid, birayê mezin bû. Dinya bêhtir jê dîtibu.

-Dostanî germe germe, dijminayî nerme nerme... Ev gotina bavûkala ye. Li ber derba xwe be, ji bîr mekê, lê xwe aciz jî meke.

Tebata Rifat ne dihat. Destê xwe avête rextê xwe; her du rextê newqa xwe vekirin, piştir her dukê nav milê xwe... Kû rext jêkirin, destê xwe avêtê xencera zîvî. Xencera wî, ji destê navê bû. Li ber tavê şînxalî di da. Kalan û destik ji serî û binî ziv bû. Sê bazinê zêr, neqşê destê Mîrzayê zivker li ser kalanê wê pêçayî bûn, dido, bi eynî temtêletê li serdestikê wê bun. Li qasî mecîdîkî jî, mezin û navê Rifat li ser nivîsî, zêr, li ser destik runandî bu. Bi lez, qutikê xwe ji bin şalê xwe derxist û xencer kire ser taziyê xwe.

Berê xwe da kekê xwe:

-Civanê me mala Sebrîyê Ferîda...

Bê gotin û galgal...

Hem wilo...

Ne cewibandî...

Bê dîtin û şêwr...

Li hêviya bersiva kekê xwe jî ne sekinî. Mihemed Seid dizanîbu; ku qehrê da ser dilê wî, kes nikarê wî bisekinêne. Dive kû ya dilê xwe bînî cî. Hedana wî na ye. Qet!.. Li bayê bazê xwe bi kêş de berda. Bi taştîya pala re kete nava suka Nisêbînê... Çar roja, seranser ji nava Nisêbînê derneket. Roja çara, nivê şevê, heydênî û hawarek li Tara Qijlê ket. Bû qîr û qiyamet... Heya berê sibehî, ehlê bajêr ji kûştina Cangîrê Huto xeber da.

Her kesî tişteke di got.

Hina got: Segbav gurandin...

Hina got: Sê xencer li ser dilê wîn da ne...

Hina got: Bi xencerê hatî niv gurandin...

Hina got: Cangîr, da ne ber gulê sor...

Roja dîn, nîvrokî, Cangîrê Huto birin nava tirba.

Rifatê Kozî, li devê dikana merivekî xwe runiştî bû. Lingek avêt bû ser lingê dîn. Hurik hurik bi merivê xwe re xeber dida. Kû, laşê bextreşê Cangîrê Huto burit, berê xwe da merivê xwe û beşî...

Bi beşîandina xwe re got:

-Bêjîyê ber çîtîk û têla... Dawî ya wan eve. Da hew dikaribe mala kesî xera bike.

Merivê wî bersiva wî da:

-Kurê ciwamêra jî mala wî xera kir.

X X

X

Ji wê rojê pê de navê muxbir û xayîna bû ev: Bêjîyê ber çîtîk û têla...

Îcar, îşev her du bira û birazî li pêşîya pêncî-şêst kesî ne. Jin û mêr... Teva, bo karê havînî bu ne rêwingî. Şewteke baş, li bayê bazê meşîn. Çawa, ji qeraxê çiyayê Bagokê xilas bûn, ketin deşta Nisêbinê, Mihemed Seîd da pêşîya wan û li wan hilat.

-Ha bavê kê, dest hilînin. Parîkî lez bikin, heya em îpekê xelas bikin...

Rifat, ji roja bêbextîya Cangîrê Huto û vir de, ehd û eman li rih û canê xwe dabû, kû qet rêzana ne de pêşîya xwe. Hew li kesî êmin bû. Di dabaşa hidud de, ji xwe û kekê xwe pê de, qet pêça xwe ne dida kesî. Bêbextîya Cangîro, jêrê bû derman. Berî bi rojekê, di çu ber hidud, nêzî têlê; bi hêceta dextê û werza, an şuva... Xweş meyze dikir, armanc û nişanîyê rê, ji xwer di dîtîn. Essehî dikir... Bi çavê xwe, heya bi kemîn û kozîkê romî ya oxilme dikir, ji nu qerara xwe dida. Emrê xwe di van rîya de derbas kiribû. Bê çawa gundê Kozê û serdorê wê nas dikirin, ber hidud û nava hidud wilo nas dikir. Pirr zor û kotekî dîtibu. Pirr rezîlî û tab û rebenî dîtibû. Wê êvarê jî, wekî her car, xwe ji Bago-kê di berdan.

Bi sunda bav û kala sund dixwar. Derdikete derî bajêr... Bi geyê, bi dara, bi kulîlk û kevira şa di bû. Di ber xwe de!... Serê xwe dirakir, berê xwe di da rojê, li dijarîya rojê di nerî... Tim bi tenê!... Sunda hawarê!... Sunda tifaqê!... Sunda qewetê!... Di got: "Vê carê jî, ez kesî, bi rêzantî bi xwer nadim pêşîya xwe." Lê dida di çû.

Sunda bav û kala ev bû:

Bi tûr kim,
Bi nîr kim,
Bi gayê pîr kim...

Sunda qedîm...

Sunda kedê...

Sunda qewetê...

Sunda rastîyê bu...

Ne derew, ne bêbextî... Nê bexîlî bû.

Tûr, beramber ked û qut bu. Nîr, bereketa bi xwêhdan bû.
Ked û bereket beramber nur... Roj bû, şewq bû. Ra û Hû bû.
Bawerî û qinyat bû. Gayê pîr, keda mila û desta bû. Bereket
û karê bi xwe dest bû. Berî Îsa bi çar hezar sal ev sunda gelê
Kurd bû. Pîrika Rifat tim bi vê sundê sund di xwar.

Kû A bû, cotê malê li dar bû.
Tur-î li mila bû. Tov tê de... dagirtî bû. Şahî li dila bû.
Kû Hu bû, xortê malê bin bar bû.
Nîr nura li malê bû. Qutê salê genim bû.
Kû Ra bû, semyanê malê bav û bira bu.
Gayê pîr jî, tim li ber deriyê malê bû.
Hûû! Gîdî gîdyano kanî semyanê Kurda...
Kanî Key Kûbadê Kurd kû li xayîna bide dar...
Kanî Korêş kû bi perçiqênê serê dubişk û mar...

LI zarok û nebîyê xwe di hilat:
-Lawooo, lawoo, roja kû ev sund ji nava Kurda çû, tifaq
û dost û yarî di nava wan de ne ma. Em ketin bin des-
tê kedxwerê Mongol û Tîmurê kulek, lawooo, lawoo!..

Lawoo, lawo...

Barê Kurda girane **lawoo, lawo...**
Dostê Kurda tune ne **Lawoo, lawo...**
Dijmin zalim û xedare **Lawoo, lawo...**
Xayinê Kurda pîr in **Lawoo, lawo...**
Poşmanî neyê bîra wan **Lawoo, lawo..**
Kû tifaq nebe pîr hawar a **Lawoo, lawo...**
Kû yekîtî nebe yekcar zor e **Lawoo, lawo...**
Wê halê me Kurda çawa be **Lawoo, lawo...**
Kanî roja em bêjin bav û bira... **Hûû Xwedo...**
Kanî roja bêt ew şahî ya dila... **Delal Xwedo...**
Kanî roja ala rengî çu serê dara... **Qurban Xwedo..**

Erê, mîna Şikrîyê Emîn, ti ecêb û xulyaqetê qedîmî ne dîtîbun. Lê pîrr tiştê xerîb û bê serî û qun dîtîbun. Salifa Şikrî, bi guhê xwe his kiribu. Li oda Tirbespîyê... Giregir li odê diket. Şikrî, ciwamêr, ji bavûkalê xwe de mal mezin bû. Xwedî eşîr bû. Ji ber Tirka bazdabu, xwe li mala Haco girtibu. Di odê de, di nava pencî mêrî de salifa xwe got. Salifa nayê bawarî... Ecêb û kes nedî ye. Lê, ciwamêr ne mecburê derewan bû. Sal, 1927 te... Tirka li wan jî qewimandî ye... Ew û sê zilamê xwe, şev û roj dikine yek û ji ber romî ya baz didin. Ji Bagokê, da dikevîne berîya Nisêbînê. Şev nivê şevê ye. Çavê tirsê û xerîbîyê ye. Di lezînin. Bayê bazê û qet na sekinin. heya di îpekê di burin, qederekê jî di meşin. Bêhna wan çikîya, qeremê wan sist dibin. Li ber hidudê Surî ne. Tirs bêje ne ma ye. Hinga mayin û têlê bi dirih nebun. Di runin, tivingê xwe dideynine ser kabê xwe, bêhna xwe diberdin. Her sê zilamê wî, bo çavê xwe germ bikin, betla ser xwe parîkî sivik bikin, serê xwe dideynin. Şikrî, zane ye, dinya dîtîye, bi hisabe. Guh di berdê serdorên xwe, çavê xwe hurik hurik li dora xwe di gerîne. Dibe nobeçîyê xwe û her sê hevalê xwe. Pir wext di navê re ne çû, du çavikê rojê, ji çiyayê Bagokê xwe berdan. Mîna di çavikê trimbêla. Hinga navê trimbêla hebû, lê kesî li wan serdora qet ne dîbu. Nexasim li çiyayê Bagokê. Peya bi peyatî, nîkarîbû di serê çîyê re seranser bi meşê; trimbêl ji ku dikarê herê serê çîya. Şikrî, çavê xwe ji her du çavikên rojê qut nekîr. Her du çavên mîna rojê xwe berdan û hat... Rast berê xwe da wan. Şikrî hebitî, di cihê xwe de ma sekinî. Herdu çavikê rojê, hat û hat û hat, bi hişşên li ber wan da û burî. Qedera sedik erd çu û li xwe fitilî. Li vegeêrê jî, himmên û hişşên pê ket. Rast berê xwe da wan. Şikrî, meyzand kû rast hate ser wan. Nav di xwe de; çawa ez Şikrîyê Emîn

bim, li ber xulqetekî bi şilim, hêbet bigirim û ji dest hılanîn bi kevim. Birrên pê ket û da xwe, berê tivingê dayê, pênc fişek li pey hev li ser danîn. Qorêna gayekî ji wî mixloqatî hat û miştî erdê bû. Her sê hevalê wî ji xew hilçenîn, dane xwe, ber pê bezin. Şikrî, li wan hilat. Hevalê wî çiqas gotin û galgal kirin, jê pirsîn jî, qet devê xwe ne vekir. Ber kû wî jî nizanîbû çîye; bes, çavê mîna rojikê dîtibun, xuşşênî û himmênî kiribu, hewqas. Wîn çî bêjê wan. Çi gotibana, bê fêde bû. Şev reş û tarî bû. Qedereke dî man li wir. Disê her sê hevalê wî xilmaş bûn. Şikrî, çavê xwe li serdorê xwe di gerand. Dîse, jî wî cihî, ji çiyayê Bagokê, du çavên mîna rojikê berjêrî deştê bûn. Şikrî, dêl her sê hevalê xwe kir. Rabun, bi rê ketin; Lê çavê yekî ji hevalê wî li her du şewqê kû ber bi wan dihat ket. Dengê xwe kir û gote hevala. Lê Şikrî bi wan de xeyidî. Bi bez ji wir durketin. Li horên û qor qora wî xulyaqetî vegeerîyan. Li cihê kû lê runiştibun, ew mixloqat, berê çavikê rojê dabune azmên û di zurî. Şewq hin bihin ber bi azmên bi-hawa ket.

Ev salifa; ji devê Şikrîyê Emîn bihîztibu û guhdarî kiribu. Ji wê rojê û virde, li çiyayê Bagokê, bi pîrozî di nerî. Ev ecêb û kes nedî bû. Lê Rifat, tiştê hê jê eceb-tir û kes ne dî, di vê rê de dîtibun. Ecebê xaliqê erdûazmana di kevin serê meriva de; ew Xwedê ye, ecêb û xulqet karê wî ye; êbret û mucîza şanî însana bide, dibe û dikarê... Lê benî-beşarê tema, bextreş, şermearê xulqetê însanî dur û kûr in. Kinêt in...

Îro, ji fedîbûna, mecburî, bêje kû bi zorê ketibu bin vî barî.

Rifat, merivekî namdar bû. Di hêla Torê de, kesî lingê

xwe li ê wî ne dida. Qaçaxçî hew di sere hebun. Rêberî û rêzanî ne karê wî bû. Rifatê Kozî, kû xwe di berda dora Nisêbînê her kesî dizanîbû; karwanê wî ne kêmi deh duwazdeh dewarê mezine. Hesp û qantir. Yan, bi hejmara hezar û hin pazê sorik. Qet, kesî din jî, namdar ne namdar, bi tiving, ne dida rex xwe. Ew û birayê xwe. Bes... Qinyatî bi kesî ne tanî. Pirranî, tirsawî, ji gotin û lomê dinyayê bû. Şehreza bû, dûr meyzên bû. Kesî jî, ne dît kû wî, di şer de, kab berda erdê, ji ber romiyê cil şînik bazda ye. Kes ne bu ye şahid. Ew yek, ê diduwan jî, Silêmanê Mihemedê Qehwecî... Ji gundê Çêlik... Li ser darê linga, şîpê, bi dest xwe re, şer dikir. Car cara, kû hemberê wî dûr ba ye, kaba rastê di berda erdê. Kû şev tarî ba ye, dengê xwe jî dikir. Zirt û gotin dikirin. Hêriş di berda ser kozik û kemîna. Zirt û bangdana wî, tim bo hevalê pêre bû. Bo xof û tirs nekeve dilê wan.

Vê carê, rêwingî teva walatliyê wî bûn. Berê wan li Bêrudê bû. Bo kar di çun. Rêzanê kû qefla pêşî bir, hew wergerîya. Derew li wan kir. Ew jî, li her kesî êmin ne dibun. Jin jî, bi wan re hebun. Doza namusê giran e. Man heyirî. Dawî, Rifatê Kozî hat bîra wan. Lê Rifatê Kozî ev kar ne dikir. Bi hêsanî xwe ne dida ber bar. Wê çawa bit. Bi hev şewirîn. Ji hev pirsîn, li dost û hogirê wî pirsîn. Rêya xwe ne dîtîn. Ser spîkî ji ê wan, rêwingî teva li hev dane hev û gote wan.

-Çend mêra ji xwe bi neqînin; bila zanibin xeber bidin... Ew çend kes herin mala wî, bê gotin xwe bavêjin pişt derguşa wî. Rifatê Kozî, serê wî jî tê herê xatirê mala xwe, bextê mala xwe na şikîne. Derguş jîyana berdewamê ye. Adeta qedîm ya Kurda ye. Lê hun zarokê doh in.

Nezan in... Heya kû ne bêjê erê ji pišta derguşê ne rabin. Emanet û qiyamet...

Biya ser spîyê xwe kirin. Çar kes ji xwe neqandin. Eynî roj, qista mala Rifat kirin. Nîvrokî, li derîyê wan xistin. Çawa ketin hinduru, her çar çûn li pišta derguşê runiştin. Rifat ma şaş, ma heyirî.

Çu hemberî wan runişt û got:

-Fermo, derdê dilê xwe ji min re bêjin. We, rê ji ber min girt. Namus ne têde, kû serê kurê min be jî, ez sekinîme.

Her çara bi yek devî:

- Em dexîlî derguşa te bune...
- Em di bextê namusa te de ne...
- Bi hêvike pîrr mezin em hatin mala te.
- Tu çiqqas pere dixwazê...
- Vê carê û ne ticcar din...

Rifatê Kozi, serê xwe hurik hurik hejand.

Di xwe fikirî. Di neçariya însana fikirî. Zanî bû, fam kir, kû rê li ber wan e. Ew meriv, serdorên wan jî, her sal diçune Bêrudê. Çar-pênc heyva kar dikirin. Ev kes, di pišta derguşa min de runiştine. Xwe avêtine torûbextê mala min. Sitara mala min. Hevî ya jîyanê ye. Ne yek, ne dido... Birrek... Kesê di gund de hene, xort û qîz, bav û kûr... Ez nekim, ne bêjim erê, wê bibe qêl ji min re. Ezê bikevime devê netkesa, ne kûrê ciwamêra. Ezê bimegotinê devê qehwa û dikana... Heya dinya dinya be; ev kes, ji min, ji malbata min wê bi gazine bin. Ne tişteki hindike. Bez û reva min, keftulefta min, bo zarokê me ye. Bo sibe û disibe ye. Îcar, îro bi destê xwe xerabikim, çê na be. Ev tişt li darê dinyayê na be.

Ev kar jî, ne karê min e.

Ez dikarim kekê xwe bişînim. Bo kû rêzantî ya wan bike. Qinyata min bes li wî tê. Ew be, ez dikarim li ser sidanê piştê razim; xeyal û tirs qet ji min re çê na be. Wê bikêr bêt. Çawa hebe, bi çi lewnî be, meqseda wan bi ci bike. Lê!... Lê, sed tifaqê dinyayê hene. Erê, kû bi silametî derbasbibin, ser bilindayî ye. Û ne bin?... Tifaqin biqewimîn, tiştin bèn serê hina ji wan. Birrek ji wan ke-sa jin in. Maazallah, berek li jinekê baliqê, hin ji wan pêl mayinekê bikin... Em hetikîn. Di bin stuna azmên de hewya me ji destê bextreş û zikreşa na mîne. Ezê çi bêjim ji xwe re? Ezê çi bêjim zarokê xwe, çi bêjim birazîkê xwe? Ezê çi bêjim jinbira xwe? Ezê çi bêjim serdorên xwe? Dijmin hene, dost hene... Dost!... Erê dost in... Parîkî, wê min fam bikin. Êşa min ya wan e... Lê dijmin!... Lê zikreş û bexîl!.. Ezê çi bêjim?.. Na!.. Na!.. Bila ez bim, ne kekê min be... Bila ez bim.

Ya sitar...

Sitar ji ba te Ya Hu!...

Bextê min û malbata min wê reş bibe.

Bila ez bim, ne kekê min be...

Neçarî ye!...

Erê ye!...

Rifatê Kozî, ne merivekî ha yela ye, kû bextê mala xwe reş bike. Li hêla Torê, bi navûdeng e; gundê wî, bi navê wî dihat naskirin. Mêranî, wesifdan bi navê wî dihat saloxdan. Serokê qaçaxçîya ye. Welatparêz e. Çekê şoreşa Iraqê, bi rîya wî derbas dibun. Li hêla Midyadê sê kes bûn. Hiseynê Hêştirekî û birayê xwe Evdo... Ebdilcelilê Helexî... Rifatê Kozî û kekê xwe... Mêrî çê bû!..

Di mala xwe de ciwamêr bû... Dostê dostê xwe bû; tēbayê dilê dijmin û xayîna bû. Destê wî dirêj bû. Xwedî xeber û soz bû. Nikarîbû bêjê na!.. Na!.. Bo wan însana ser jêkirin bû. Ji qutê salê dûr kirin bû. Rifatê Kozi, xwedî tol û ol bû. Na û nikarim, di ferhenga jîyana wî de tune bû. Qedexe bû. Nexasim ev sedema giring hatîye ser cila wî runiştî ye. Şerefa mala xwe na de, ne bi malê dinyayê, ne bi rih û canê xwe û zarokê xwe. Jîyana wî li ser qencî û ciwamêriyê hatî avakirin. Bingeha jîyana xwe wilo danî ye. Heya vê kêlikê jî wilo berde-wame. Kesî, gazin jê ne kirîye. Lom lê ni kirîye. Xerabiya wî ne da ye alî ti benî beşerê xwedê. Ne dost ne jî dijmin. Dijmin jî, bo soz û qerarê wîn, bo gotin û rastî ya wîn, mêr û mêrxasî ya wîn, merd û ciwamêrî ya wîn mitirb bûn.

Erê ye!...

Lê bi çi miqamî?..

Û kengî?...

Dexalet...

Hêvî ya jîyanê...

Jîyan qet na ye listikê...

Hêvîya herî mezin...

Kû kêr ne gihê hestu, kezêb ne birije, dil nebe xwîn, kes xwe dexilî kesî nake; xwe na vêje pişta derguşa kesî. Mêrê hêla Torê, ji xwe bi hêvî ne, ji xwe qayîl û hij ji xwe kîrîne; Zûbizû na hêlin kes pêl wan bike. Axa Torê têr kevîrê heste ye. Agir pê dixê. Sexleme. Xuyaye kû neçarî ye. Neçarî pirr zor e. Siluka mêra dişikîne. Xwedê mala feqîrtîyê û êsîrtîyê xerabike. Îro, ne ev meriv tenê; ne bes, hêla Torê; Bota, Rama, Zozan û Serheda, teva êsîr in. Belengaz in. Reben û pepukê bin

destê kedxwerê Tirka ne. Reben û pepukê bê kesîyê, bê tifaqîyê ne; Ketîyê destê bextreşê ne ciwamêr û xayîna ne. Xwedê xerabike mala xayîna. Ev welatê têr û dagirtî, di bin lingê romîyê qun bi riqa de, tê perçiqandin. Hawara xwedê, yek romî, gundekî xera dike. Ev Welatê tevî maden, tevî av û deşt... Ne kar û ne bar... Ji alîkîve fitne û fesadî ya hikumetê... Dibendî ya kû dixê navbera Kurda de... Ji alîyê din ve, axayên ked xwer û xayîn... Bo menfatê dinyayê, berberî ya kû dixê navbera Kurda de. Kes tune kû pêşî serê axayên xayîn û bêjîyê ber devê derîyê hikumetê bi perçiqîne. Kes tune, kû fiqrûfeqîra ji bin zilma wan kurê netikesa xelas û azad bike. Kes tune, kû tifaqîke baş û berdewam bike nava gelê Kurd. Wan li hev koz bike. Wan li hev ragirê. Wan li hev kom bike. Tuj û dijwar bike. Bi hewn û dîtîn bike. Bi sawmûsalat bike. Berê wan bide ser dijmin. Êdî hew kes dikarê parîk nanê rehet, bi xweşî bixwe. Gelacî ya zikreşîyê, wê pîjekî, an hejekî bavêje nava lingê wî. Hikumet jî, li mêhnekê ye, bo kesa çav tirsandî bike. Çîk ji kesî ne rê!.. Kes çav bel ne be!.. Kes bi xweşî û biratî, bi cîrantî li cem hev ne rune! Qet!... Yekîtî, hevaltî, biratî, cîrantî; şîrîkatî, ne kevê nava gelê Kurd de. Hikumeta Tirk navê!... Bi zanîn û bexîlî, bi zanîn û xebîsî fitnê dike. Bi zanîn gellacîyê dikin, bi zanîn fesadîyê dikin; bo, Kurda berdîn hev; bo, wan bi hev bidin kûştin; ew, li mala xwe pal bidin, rehet runin. Welatê zêrîn, bi maden xemilî, bi rehetî xilmet bikin. Bixwin, vexwin, rabin, runin, bibezen, bigerin. Meydan ji wan re vala bimîne, bo hespê xwe xweş û qenc bibezen. Li gorî dilê xwe... Kes hemberî wan dernekeve. Kurd bikevine zîqa hev, bi hev bilebikin; jîyana wan tim bi jarê û hawar be; ew liser kerkidanê xwe suwar bin. Kêf û şahî ya xwe bikin.

Dem dema gelaca ye.
Wext wextê xayin û fesada ye.
Roj roja kedxwer û mifsida ye.

Erê ye!...

Rifatê Kozî nikarê bêjê na. Ti rê û rêçik ne ma ye. Mecbure... Jîyana bav û kala ye. Jîyana qedîm... Ti kurebav, merivê kû xwe avêtin pişt derguşê, nikarê vala vegerênê. Nikarê ji mala xwe vala derxîne. Dewruqedîma de çê ne bu ye. Çê jî nabe. Adet ev e. Tol ev e. Kuştina mêra be; revandina jina be!.. Dexaleta pişt derguşê; tol a mezine. Hevî ya giring û pêwistî ye. Ne karê zaroka ye; barê mêr û mêrxasa ye. Avêtina pişt derguşê nayê red û hed kirin; nayê xerakirin; sedem çî be, tê ava kirin. Axa Mezopotamya germe, têr rewa ye, diya ferxa ye; sitara nebî û sebîya ye; dayîka neçarîyê ye... Roja kû dinya ava bu ye, heya îro, kes reben, tengezar, pepûk, şepirze, belengaz ne hiştî ye. Hêla Torê jî, navroka axa Meda ye. Nevroka jîyana rez û werza ye. Bi çiyayê xwe ve, bi deşt û newalê xwe ve, diya sêwî û fiqrûfeqîra ye. Bav û bira ye. Tol û ol a jîyanê ye. Kanî û ava ji serheda xwe diberdê nava Mezopotamya ne belaş û bele heq di nava Torê re diçe. Bexçê Îrem e... Cihê Adem û Hawa ye... Sekna Nebî Nuh e... Agirê Nemrud e... Kesî na şewitênê... Şewq û ronahî ya pêxember Birahîm e... Bereketa Zerdeşt û Teyrê Bazbeleke... Ne mar û dubişk e... Ne xebîs e... Ew çukê haftê û heft rengî, Tawusê bihiştê ye... Cihê Hurmuzgeh û pîrozê ye... Cihê parez û helezê ye... Xêra Ahura di nava wê de ye. Ehreman, ji dema Mansurê Çirikvan û vir de jê bazda ye.

Rifatê Kozî dinya dîtîye. Zane ye. tevgera jîyanê xweş

dizanê. Kurdê bi dil û hewn e. Avêtina pišta derguşê û neçarîya însana xweş nas dike. Feqîrî û belangazî dîtîye. Jiyana Kurdîstanê xwîn û tab û rebenî ye. Wê jî xweş dizanê. Jiyana zorê ye.. Têr xwîn û xwêhdan e.

Ciwamêr, bîra dinyayê dibe. Kevnare ye. Xwedî bext û ojdane. Xwedî tol û ola axa Mezopotamya ye. Ser û lingê wî, bi hevîrê vê axê hatî ye hevîr kirin. Têr rewa, şî-nî û fêkî ye.

Berî her tiştî...

Bar pirr giran bû.

Barê kû yek nikaribe hilgire û bikeve bin de...

Zor e. Ketin e. Nerabun e...

Şermezarî ye. Lom e... Galgala devê xelkê ye...

Wê çawa bit? Çare?...

Xwe ceriband û got:

-Meqseda dilê xwe bibêjin....

Her sê merivê din, xwe ne girtin. Li hêvîya ser spîyên xwe ne sekinîn. Xwe avêtin meydanê.

Her kesî ji xwere galgalek got:

-Me xwe avêtiye tor û bextê te....

-Em xatirê vê malê dizanin...

-Vê carê û ne ticcar din...

-Ezbenî, qefla pêşî çû, rêzanê me ê hersal bû, çû, hew vegerîya, hîle kir. Xeber şand kû ez hew dikarim bêm we bibim. Derew rast ser bextê wîn be. Îcar, kû em nerin kar, em ne çin Bêrudê, her çend heyvê havînî ji xwer kar ne kin, ti jî dizanî kû debora me na be. Em teva, perîşan dibin.

-Piştî, me xwe dexîlî namusa te kirîye!...

-Gere, ti bextê mala xwe bidê me!...

Milê Rifat pê giran bu.

-Gelî merivan, du kurê min hene. Xulamî we be, yek pazdeh salî ye. Ê din, ewê kû hun li pişt derguşa wîn in. Her dûwan bibin ser jê bikin; du berx in, fidî çavên we... Yan jî, rêzanek ji xwer bibînîn, çiqqas pere bi xwaze, ezê ji kîsî xwe bidim. Min dive kû hun vî barî ne deynin ser milê min.

Murê wan bi carek şikest. Daxwaza wan, rêzanî ya wîn bû. Xuya dike kû milê wîn pê girane.

Dexaleta wan bo wîn bû. Îcar?...

Jina Rifat du gava xwe da pêş:

-Xeberdan li min tune ye. Lê namusa min hew qebul dike. Piştî kû van ciwamêra xwe avêtîye pişt derguşa min, haşt xeydî, tu mecburê erê yî. Tu pêwistî wî karî yî. Çare tune ye. Kuştî, hiştî...

Rifat di bin çavan re, li xatuna xwe nerî.

-Hermet, ev sih salê min, kû ez şev û roj li hiduda, li serê çîya me; bi nijde, bi kemîn vî karî dikim. Ji roja kû ti gihaye min, heya îro, te dîye kû min, careke bi tenê, xwe ji ber karekî da ye paş? Na!... Barê jina giran e. Rêyeke qaçaxe, rêyeke bi têl û mayin e. Sed tifaqê dinyayê hene. Kû qewimî, berek hat û li jinekê ket... Berê sor e, kû ji devê tivingê filitî, heya li tiştêkî naliqe, sekin jê re tune. Tiştêkî wilo bibe, ezê ji xwe re çî bêjim, ji xelkê re çî bêjim? Xelkê çî duvika li pey min bigerîne? Tu jî dizane kû dijminê min, bêhtir in ji dosta... Zikreş û

hesudê dinyayê deyne derê han... Devê xelkê ne devê hebana savêr e, kû tu benekî lê bi pêçe, xweş û rind bi şidîne. Lomê dinyayê giranin. Gotin û galgalê devê dikanê Midyadê, Estilê, Hezexê, Nisêbînê, Kerboran û Gercosê... Kû kat da, bi sed sala tovê wê naye qelandin. Ezê rastîyê bigihênim ber devê kîjan dikanê?... Hêêêê?!... Ti ji min re bibêje?...

Bi xeberdana wîn re, her çar zilam, ji qerem ketin. Bê hemd, ketin ser duvikê xwe. Bêhna wan çikîya. Canê her çara, hat serê pozê wan. Qerem li wan şikest in. Zimanê wan, di devê wan de mezin bû. Lalûebkem bûn... Kerr û lal... Hişk bûn. Serê xwe tewandin. Xwîsiya wan di qirika wan de sekinî. Dilxweşî ya wan pîrr ne domand. Lê çirîskek hebû. Gotina xatuna wî, ronahîyek pîrr mezin bû. Tirsa wan, hişkîya Rifat bû. Ji xeberdana xatuna xwe aciz bibe, bêje na, min xebera xwe got, xelas... Yekcar kambaxe... Wisa bêje, li egsa xwe siwar bibe, zor e. Serê zarokê wan hat jêkirin. Kuflet teva man birçî. Malî teva şepirze bun. Rê ya Edenê, Îzmîrê bigrin jî, karê wan welatê kû dibin himyeta Tirka de, bê xêr û zewad e. Bereket tune ye. Kesî ji ber lapê Tirka xêr ne diye.

Car din Xatuna wî dengê xwe kir.

-Ev bîst salê min, kû ez gihame te. Te dît kû min rojekê ji karê te xeber da? Na!... Lê ev kar, buye sedema namusê... Ne karê dinyayê, ne bazar û danûsitandina xêro dêro ye; ti bîra wan tiştên kû te rêzandin dibe, lê ti bîra gotin û lomê netkesa, kû tu kesa ji piştta derguşa xwe bê mirad rakê, bi dilekî şikestî bi rê bike nabe. Sê emanê xwedê bit, ezê serê xwe li ber xwe deynim. An kuştina min, an jî erê ye. Dêhnê xwe bide kurê ciwamê-

ra, di pišta sebîyê te de, bi yek gotina te, rih ji wan çu. Şerme, vê şermezariya han dive kû ti newênê ser mala min; Ez diya zarokê te me, hêviya kû ez ji te dikim ev e.

Bêhna Rifat teng bû.

Serê xwe hejand.

Li xatuna xwe bi awireke dijwar nerî.

Di ber xwe de xeber da: "Ev jin, kû emrê wan bibe sed sal jî, aqilê wan na sitewihê. Jê weye kû ezê wan bê mirad bi rê bikim. Na hêle!... Na hêle kû ez ya dilê xwe bênim cî. Ne bo pera, bo kerdekî... Ev kesên ha wê sibê, disibe lazim bibin. La hewle... Ya huuu!.."

Kebaniya malê rast di got. Ew çî zane kû çî di dilê zîlamê wê de heyê.

Rifat di xwe fikirî. Ne bêje erê, miradê dilê wan bi cî neke, gotin û lomê dinê, hê bêhtir wê bîn ser. Destê xwe hejand û di gava ber bi derguşê çu. Li zilama nerî, di cih de sekinî. Dêhnê xwe, mîna xatuna wîn gotî, bi lezeke dijwar da wan; dilê wîn êşîya. Di cih de qerara xwe guhert. Ne hewceyî kû wan bi cewibêne, bê şert û şurut wan deyndarî xwe bike; ebeden, di cî de û rastûrê bibêjê fermo werin ser cilê erê ye. Tişteki xerîb, kû di emrê xwe de, di rengê tu însana de ne dîtibû. Bîrîndar dîtibun, bîrîndarê tivingê, bîrîndarê xencerê, kesên di ber zikratê de dîtibun; lê yek ji wan ne bi temtêleta van însana de bû. Rengekî nayê wesifdan û xebardan ketibû ser ruwê wan. Her çar zerezîpê mêra, ji mêranî ketibun. Bubune lepik. Milê wan bi ser tihêlê wan de hêrivtibun. Laşê wan, bi ser hev de hatibu dewisandin. Mîna kesê di şer de bi şilihe. Şiliha bûn; rewa mêranîyê hew di wan di gerîya. Xerîb bû.

Di ber xwe de:

-Min çikir... Bê deng û peqandina fişekê, çar mêrê xelkê di mala xwe de, min kuştin. Bavo, bavoo!... Ne xerîbe!... Çar mêrê mîna çar hogica, mîna risasê di nava agir de helîyan. Hestuwê wan bi ser hevde ketine, hêrivtine. Bi serê bavê min, hew rewa di wan di gere. Bavo, bavoo!.. Ba, sê ehdê xwedê li rih û canê min ketibe, ya ezê xwe bi definînim, yan jî ezê van kesan derbasî binya xetê bikim.

Pêre pêre dengê xwe kir:

-Gelî ciwamêra, meqseda kû hun pê hatina ser çava. Bê xilafî, bê şik wê bi cî bibe.

Bi derbekê serê xwe rakirin. Her çara bi carekê re. Ye-qin nekirin. Gotina devê Rifat bû, ber bi wan çû û got. Mîna xewnê hat. Ji xwe û qubala xwe bawer nekirin; bi guhê xwe his kirin, bi çavê xwe jî dibînîn kû Rifat hemberî wan e. Destê xwe ber bi wan dirêj kirîye. Hew dizanîbun çî bikin. rabin, runin, bersiv bidin. Li hev nerîn. Paşî, teva berê xwe da ser spîyên xwe.

Rifat dêhne xwe dayê kû şelişîne.

Car din dengê xwe kir.

-Hun kengî dixwazin?

Îcar helêle. Şik û xewn tê tune...

Rifat qerara xwe da ye, pirsra rojê dike.

Bo meşê, rê û şîvîla di deyne.

Ruwê her çara bi derbekê re geş bû. Elameta mezin bû ev pirs. Wan jî bi vê hêvîya mezin xwe avêtibuna pişt a derguşê. Xweş dizanîbûn kû Rifatê Kozî bextê mala xwe

xeranakê, yek; tol û ola xwe bernadê, dido; gotin û lo-
ma qebul neke, sise; mirin be, hiştin be jî erê ye çar.
Lê çawa?...

Gelo ewê bi xwe be?

Yan hineke din wê bişîne bi wan re?

Ya dilê rêwingîya ew bu. Şexsê wîn... Bo, jin bi wan re
hebun. Rê ya qaçax e, û namus e... Di cihê wilo de li
her kesî êminatî na be...

Her çara bi yek devî:

-Kengî ti di xwazê, em hazir in.

Rifat dizanîbu, kû bêje ne bêje ew, ji piştta derguşê
dernayên. Heya kû qenc û rind erê nekin Xatuna wîn,
ne hişt kû pirsê xwe bike. Parîkî lez kir... Îcar niha ew
ferezend kete meydanê. Berî kû bêjê erê, çend pirsê wîn
hebun. Divabu wan dizanibe.

-Hun çend kes in?

Her çara bi hev re bersiv da.

Gotina yekî li yekî der ne ket.

-Dor şêstî...

-Pencîyek...

-Pencî-şêstek...

-Çil, pencî, şêstek...

Rifat serê xwe hejand. Merivekî zana û di cihê xwe de
giran bû. Jîyan esseh û sexlem digirt, wisa jî li jîyanê di
nerî. Gotinê her çara ne wek hev din bûn. Rifat pêça
xwe ne da ser şaşî û xeletiyê wan. Ha çil, ha şêst... Çi
ferq dike?...

-Hun carne din, di vê rê de çune?

Sisîyan jê bersiv da:

-Belê ezbenî...

-Bêje, her sal...

-Em ne xerîbê rê ne...

Yekî deynekir.

Rifat pirsaxwe berdewam kir:

-Ewê din jî çu ne, an no?

-Belê, di nava wan de kê m hene kû nu diçine bi vê rê de. Lê ê kû çend cara çune jî hene.

-Jin jî wilo...

-Mêr jî...

-Em ne hewqasî tengezar û belengaz in.

Rifat ya dilê xwe got:

-Bo rê dibêjim, da em zanibin em çi dikin.

Ser spîyê wan bersiv da:

-Ezbenî, em di vê rê de pîr bûne. Lê em noqta, kemîn û kozika nasnakin. Em li bextê bêjîk û sêweleka jî ewle nabin. Tirs na kevê dilê me de, xof ji me re çê na be. Lêê...

Rifat gotina wî birî:

-Belê, ez dizanim, pirsax min ne ewe, bo arîkarî ya kesa û şevê ye; barê şêst kesî, merivek an dido nikarin hilgirin.

Dîse ser spîyê wan bersiv da:

-Pênc an şeş kes mîna dilê te bixwazê dikarin wî barî hilgirin.

Rifat car din ji cihê xwe rabu, ber bi wan çu, destê xwe dirêjî wan kir.

-Rabin îcar, werin ser cilê...

Her çara da xwe kû rabin, bi rabuna xwe re jî pirs kirin:

-Erê ye, ne wisa? Bila dilê me di cî de be.

Rifat, beşîşî:

-Erê, erê!... Qet xeyale mekin. Kû kuştina mêra be, kû revandina jina be, kû anîna tirs û talana be; wele ez ne

Elîkê Batê me kû wesfê xwe bidim; zirt ji mêra re şerme, lê sê ehdê xwedê li rih û canê min ketibe, kû avêtina ser qunaxa hikumeta Êstilê be, na tinîne. Bextê mala min bi were ye. Em teva kurê axakê ne, hun dizanin kû malbata min bi ol û bexte.

Her çara destê xwe danîn ser sînga xwe.

Lê serspîyê wan xeber da:

-Eşşedûbilleh!... Ez di sediqênim kû ev mal xwedî bext û tol e.

X X

X

Ew çar sal bûn, kû Rifat mala xwe anî Midyadê. Berî deh sala erd kirrî... Li neqeba Midyadê û Êstilê... Nêzî Midyadê... Erd mezin bû, li gor dilê xwe xanî ava kiribû. Teva ji kevirê **qatoro**... Bi destê hostenecarê **Mala Hewşo**. Dora xanî kiribu bexçe. Dargul û sosin... Kulîlk û darfêkî... Mêw û hejîr... Hêtê dora xênî ji kavirê reş bûn... Heft derence bihewadiketin ser resifê. Bin xanî de qebo hebu. Hinduruwê qebo tejî qulûqewêr bûn. Sed şop di nava dîwar de çê kiribu. Xeşîm û kîzên dirêjî nava bexçe dibun. Ber derîyê mezela mêhvana parîkî fere hişti bu. Bo dêliyê... Li pêşîya xanî, li qaraxê qaboyê û her du anîşkên xanî çar mêw çandibûn. Şivê mêwa dabune ber spîndara. Çar kuç, çar spîndar... Her çar spîndar çargoşe û çarmêrkî bi heve girêdabun. Divabu bike kol... Lê ne bi çilo... Mêw xuzeyî ye... Siha wê hînîk e... Dîtîn û şiklê wê bedev e. Tirihê reş, zeynebî, deywanî û misebiq... Her çar mêw, her yekî tamek... Misebiq zû digihe,

duv re deywanî... Hê ew xilasnebuyî zeynebî digihe, dawî reş... Reşê mîranî... Qet tirih ji dêliyê xalî ne dibu. Bi zanîn şivê mêwa neqandibun. Şiva misabiq, ji Nihilê anî bû; ya deywanî û Zeynebî ji Mizizexê, ya reşê mîranî ji Dêrhavê anî bû. Û sê şivê hinara. Radîşo, tîrş, şêrîn... Pîrr hej habirman dikir. Dermanê dilaye. Exlebe ya tîrş. Bi destê xwe li teva bexçe guhdarî dikir.

Rojê li mal bu; sibeha, bi bangdana melê re, dikete nava bexçe, heya germê bida dinyayê; taştîya pala, kolan u avdan dikir... Ber êvarî jî, roj li ber ava, geyayê bêjî di neqand, derman dida, katik û şivê berranî qut dikirin. Çal dabu kolan... Pîrr kûr û fere... Ava serê ban, bi borîya diketîyê. Cok ne bû, borî bun. Ava wê xweş û sar û cemed bû.

Li ser qeboyê çar mezela ava kiribun. Ya pêşî û mezin bo mêhvana, ya hember, bo xortê malê; her duwê din, li paş bûn, bo maliya... Kîler, bixêrî û metbex di navbera her çar mezela bun.

Mezela mêhvana li gora dilê xwe raxistibu. Merş û xaliçe, ji dora wanê kiribun. Kursî teva bi wan merş û xaliçê çilûheft rengî nixumandî bun. Büro, xizêne, hunerê destê Silêmanê Temo bun. Binê mezela seranser xaliçe raxistî bu; Bostik ji dermana re vala ne hiştibun. Li herdu taqê mezela, çar berhemê desta, karê salûmiha, xemilî dalaqandî bun. Cihê kû tim Rifat lê di runişt; mirtala hindiru xaliça hevrişim dalaqandî bu. Xalî jê diçu. Li tihêla xaliçê, karê desta, li ser hîzar Şahmaran û hefrîtê xwe; bi maqultî di sekinîn. Şahmaranê çav kilkirî... Şahmaranê por şekirî... Hinarkê ruwê wê mîna di sêvê xelatî sor dikir.... Bi çavekî ji xwe qayil û kubarî li din-

yayê dinerî. Hunerê destên qiza wî bu. Di ser Şahmaran re, xurcezîneke biçuk, têr gulîk û rêşik, cemik li jor, yek li jêr dalaqandî bû. Li mirtala milê rastê, niv merşek kevn bû. Cih ciha bi hevrişim xilmet kiribun. Cih ciha bizuzk ketibuyê; qul bubu, lê destê hostênecara car din pê lebigî bû. Eyba wê hunda kiribun.

Deriyê pêşî, ê ketina hindiru mezin bu.

Lîwana navberê fereh û dirêj bu. Ji ber deriyê hember hev û paş de dîwanê raxistî danîbûn. Germa havînî, hikim li wir ne dikir, tim li wir diruniştin. Li talî, sebetke karê destê Silêmanê Temo, di anîşkê de rikinandî bu. Masa xwarinê hemberî sebetê, sipartî hêt, hazir bu. Lê Rifat, hej ji ser masê û xwarinê ne dikir. Li erdê, çarmêrkî dirunişt û dixwar. Kurmanciya gewr... Kû ne wisa xwariba ye, ji ser sifre birçî dirabu. Exlebe li mezela mêhvana sifre dihat danîn. Pirranîya roja, mêhvanê wan hebun. Roj bê mêhvan ne diburî. Kesî xerîb tune ba ye, ji sukê bi çengê dostê xwe digirt û tanîn. Sebra wî bê kes ne dihat. Nizanîbu xwarinê bi tenê bixwe. Nas û dostê wî pîrr bun. Kes diqedandin. Kesan jî xwe lê digirt. Şikestîkê kesan zav û zêde bun. Rifatê Kozî, xwe ji ber şikestîk û hewceyî ya kesî ne dida alî.

Bê çiqas Rifat di mala xwe de ciwamêr bû; jina wî, hewqas jinaşêr bu. Ne mêhvanek dido, sed suwar bi ser de bixurîyane, ne xem bu. Rifat li mal ba, ne li mal ba, xatuna Zêrîn, bi rukî spî bi rê dikirin. Çeleng û jêhatî... Mêranî û merd... Rifat kiribu wezîr. Eve kû li hêla Torê dibêjin: Jin, mêrê xwe dike wezîr jî, dike rezîl jî... Lê Zêrîna Rifat, ew kiribu wezîr.

Piştî, mêhvan hatin ser cilê, runiştin, Rifat da hişê xwe.

Pêncî, şêst meriv...
Pêncî, şêst bar tê hesabê...
Sedema pera....

Lo heyrano, ev çi dem û dewrane...
Kû pere bûn hesin...
Aborî derket ji devê gêsin...
Jîyan bû ya zorê û darê qul-î hesin;
Bo qizınca parîk nanê di nava lat û kevir...

Ev faqîrê han...
Ev belengazê han...
Ezê, ji destê wan...
Ezê, ji qutê mala wan...
Ezê, ji pariyê devê wan...
Ezê, ji destê wan, çawa rahêjim perê wan...
Bi kêrî min na ye!...
Na ye!.. Na ye!..

"Ev bi kêrî min na ye. Nikarim rajim perê wan. Çê na be. Bo min eyb û ar e. Teva feqîr in. Ji van feqîra ezê çi bisitînîm? Bo çar quruşa xwe li nava mayin û têla dixin, ji mala xwe û nava zarokên xwe dur dikevin, çarpênc heyvê wextê salê, şev û roj kar dikin; ji vir de heqqê serê xwe bidin, li vegeerê heqqê serê xwe bidin, nîvê qizınca wan diçe. Ez jî, rabim doza pera li wan bikim; na, bikêrî min nayê. Ezê dev ji pera û heqqê serê wan berdim. Qismet û nesîbê wan çar quruşa bila ji devereke din Xwedê bide. Ji devereke din, ferecek derbikevê. Helbet ji devereke din..."

Serê wîn di ber win de ye.
Di ber xwe de li kebanîya malê hilat:

-Kebaniya delal ma tu li mêhvana na pirsê?

Serspîyê wan xwe avêt holê.

-Ne hewce ye, em pirr runişt in. Ne hewceyî ezibandinê ye. Naa, xwedê wekîl be na!...

Rifat beşîşî.

-Çê na be xwedê jê razî, kes bê xwarin ji mala min derneketî ye heya kû hun derkevin. Xwedê çî biqadênê, tiştêkî sivik be jî, li me ne girin.

-Mal bi xwedî be!...

-Canê te û kesê te sax bit!...

-Havîna tiştê sivik, bar sivikaye hinavê însanî ye.

Ev gotina talî ji devê ser spî derket. Dinya dîtibu, zana bu. Bo malî ne hazir bin, tiştêkî sivik, ser pîya be jî, wan kar bikin.

Rifat, dabaş danî:

-Gelî merivên hêja!... Em bune hevalê hev û rê. Îcar min dive kû hun bîya min bikin. Heke ez rêzanê we me, gere wilo be, an na?

Teva bi hev re bersiv da:

-Tu rêzanî, tu çawa bibêjî!...

-Asil tuwî!...

-Tû çawa dizanî wisa!...

-Ne hewce ye em xeber bidin!...

Rifat gotina xwe berdewam kir:

-Tiştê kû bêjim gere "na" tê tune be. A pêşî, min dive kû xebera kesî ji çuna we çê nebe. Sed zikreş û talaqreş hene. Ne hewce ye. A din, gere kes nizanibe kû ez rêzanê we me. A sisiya jî, min dive kû hun qala pera û heq nekin. Min heqqê rêzanîyê navê. Ez tiştêkî na xwazim.

Her çara li hev nerîn, man di heyrê de. Îcar ev ne hatin û ne qebulkirineke lewnekî din e. Rengê wan xeyirî.

Rifat, di wan anî der:

-Gelî ciwamêra, qala pera ji cem xwe dibêjim. Ne kû ez we nabim. Bila tişteke nekevê dilê we.

Ciwamêra ne merdî nekir:

-Ew çawa gotine?

-Her du gotinê te ê pêşî ser çava. Dikevê aqila, lê ya dawî, çê nabe. Ne di usulê de ye.

-Bê pere em qebul nakin.

-Heqqê te ye.

-Hidud e, qaçaxe, heqqê me li te û zarokê te tune ye.

Rifat deynekir, wan ji hev re xeber dida. Li hev dine-rîn û gotinê xwe digotin.

Dawî Rifat destê xwe ber bi ser spîyê wan de hêdîka lebitand.

-Pismam, hun ji bo çar quruşa li hidudê teji mayin dixin, çar an pênc miha hun şev û roj kar dikin. Çar quruşê kû ketin destê we de, ji vir ve, ji wir ve hun bidin ê weke min, qutê salê nayê nava kufletê we. Eva hun belaş diçin û tîn. Ew rebenî ya hidud û xerîbîyê ji wer di mîne û bes. Hun li min guhdarî bikin, ev îşê mine, li hêvîya min bihêlin. Hêvî ya kû ez ji we dikim, hin qewêtî li min hene, çend kîlo feraxê malê ne; dive kû yek dido ji xortê we rahijin wan û xelas. Gere sibe na disibe, ji cem Mîrzayê Zivker rahêjimê... Lê bi şertê kû bi qewimê, sed tifaqê dinyayê hene, kû ew kes wan firaxa navêjin. Tişteki wisa çêbibe, ezê di hemberî mirovên xwe de şermezar derkevim. Tiştine din, wê bên bîra wîn. Min navê, dostê bavûkala ye. Ne kû kes tune ye

rahijê wan feraxa, birazîyê min jî wê be; lê min dive ew li kesa guhdarî bike. Rê ya çavê tirsê ye, hun bîya hev nakin, lê ku ez yan kekê min, yan birazîyê min be, hunê bîya me bikin. Wekî din doza pera felan mekin. Qet. Bi pera bit, ev kar ne ê min e. Şerme, çar quruşê we ne min zengîn dike û ne ez di rajimê de.

Ser spîyê wan:

-Ezbenî, tu rihê xwe di deyne ber me, bo çend kîlo ferax, eybe em qal bikin. Sedema kû tu, ji destê me na rahijê pera bo me jî şerm e, çê nabe? Tu jî, mîna rêzanê din heqqê xwe bixwaze, ser çava....

Rifat qebul nekir:

-Hun teva sax bin. Ew çar quruşê hun bidin min jî, bila xêra dê û bavê me teva bin. Dinya ne îro sibe ye; hun jî dizanin, rêzantî ne karê min e. Karê min danûsitandina malê dinyayê ye. Kû karwanê Licê ya baye, minê hespê xwe jî bar bikirane, heqqê xwe jî zêde ji wan bixwesta ye. Îcar hun, ji alîkîve gundîyê min û cîranê min tên hesabê; ji alîkîve, we xwe avête torûbextê mala min; ji alîyê din ve, perê kû hun bidina min di ber min de na çin; ya dawî, qencîke bi we dikim, roj wê bet, kû hun jî qencîkê bi min bikin. Ne ez jî bim, zarokê min, ehlê min, dostê min... Axir!... Bila hun deyndarê min bin, ne ê malê dinyayê, ê qancîyê...

Mehvan kêf xweş bun.

-Ser çava...

-Kû ti hewceyî serê zarokê me bibe jî...

-Car din...

Rifat gotina merivê talî birî:

-Ez hevî dikim kû hun dabaşa pera bes bênin meydanê.

Ew di nav galgala xwe de ne, kurê wî dengê xwe kir:
-Yab!... Cilikê, li mezela mêhvana an li heywanê deynim.
Lîwan hênike...

Rifat lê nerî. Cilika bin sifrê di destê wî de hemberî
wan sekinî bu.

-Lawê min, li mezela mêhvana raxe. Lê bêjê dîya xwe
bila dew ji bedêla avê bişîne.

X X

X

Axa Mezopotamya!... Dayîka ferxa ye!...

Axa kevnare ye!... Ne xerîbe çerxa felekê ye!..

Bi şax û per e!.. Ser û bin tev berekete. Bin zift û zêr
e. Ser zîv û xêr e. Bo vê sedemê, li ser serê wê tim şer
û tofan e. Xwîn e, mirin e, rebenî, şepirzeyî ye... Kom û
ferman e... Her demsal, sê fermana derbas dike. Yek
xuzeyî ye, dido jê, bi destên dijmin û neyara ye!... Dîse,
rewa jê qut na be. Tim di pijkivê, tim di himhimê!.. Çêlî
dide... Tim dide... Fêkî dide... Tam û tîng dide... Dayîka
deşt û berîyan... Dayîka di sîngê çilûheft derî ye... Mîna
sed û hin kanî ye; her sîngêk, not û neh çavî ye... Şîr
û bixur e... Xem û xemyal in... Xweşî û geşî ye... Tab û
rebenî ye... Kûl û merez in!.. Şan û şahî ye!.. Berx û
kehrike... Hesreta dilê her çar wextê salê ye... Gul û
kulîlk, dar û devî... Av û kanî... Çiya û gelî... Erd û
azman... Bi hingivê şan û şanî... Têr û teji ye!.. Ha
dide... Ha dide... Sala wext dide... Heyv bi heyv dide...
Roj bi roj dide... Ha dide... Şev dide... Sibeh û êvara
dide... Dide ha dide!...

Hîrên û qîrêna kedê ye....
Mîzên û wezna mêrê çê ye...
Xêr û gunehê reş û beşiyê ye...
Axa Mezopotamya; axir dewrana dinyayê ye...

Lal û ebkem e...
Bê galgal û bê gazine e...
Dide ha dide...
Bê lom e!... Dide....
Bê xwedî ye!... Dide...
Bê serî ye!... Dide...
Bê çare ye!... Dide...
Bê kes e!... Dide...

Tim li ser linga ye. Şipê ye. Qet lokme na de. Hêl û qeweta wê li cî ye. Bê lom e. Bê gazine e. Lê qet ji haw haw na keve.

Hey axir zeman!!!...
Hey dem û dewran!!!!...
Sekna mihacir û xerîba!!!!...
Rê ya rêbuwar û aborê!!!!...
Tewla hogiç û berana!!!!...
Cihê lût û huta!!!!...
Walatê hefrît û kovî ya!!!!...
Noqta nijda û kemîna!!!!...
Mala nêçîr û nêçîrvana!!!!...

Xeml û xeyala jîyanê di navbera çîya û gelîyê wê de di fure. Hemberî rizda û şiqîlê lata hêz û hêvî ya. Warê Sîyamênd û Xacê... Bihişta Mem û Zînê... Meydana hespê Qeretacdîn e... Xwîn û kesera bê mirada ye. Nalên û sewta çun û ne hatinê ye... Qet, bala xwe na de re-

benî û belengazîyê. Ew bixwe, ji hevîrê xwe, ji bingeha kevnare; bi kaviil û xerabcihê xwe; bi mar û dubişkê nava xwe; bi nalên û kesera evîndarîya xirabo, hêdî hêdî di lorînê û xwe ava dike. Xirabo, xirabo!.. Bi xwe ser, bi keda destê xwe, bi teyrik û turikê xwe, bi dar û devîyê xwe, bi çuk û marmarokê xwe, bi gungumok û şeqemarê xwe, hêdî hêdî, di gorîne, di lorîne û çê dike. Hêdî hêdî, bi sebra dilê axê, bi şînpela dilê beharê; qirşik bi qirşik li ser hev dikê. Bi rojê kar dike... Bi şevê nijde û kemîn dike... Li mayîn û têla dixê... Li çem û çeperê ked xwerê romîyan dixê... Baran tê, sitar dike, berf û teyrok tê, bend û sekiha di deyne. Li hev di hune, li hev di pêçe û ava dike. Axa Mezopotamya Bingeha avaniya jîyanê ye.

Tixubê xurta, qet tune ye. Xirabo, xirabo!...

Mîzêna xurta, tim giran di kîşîne. Xirabo, xirabo!...

Hitudê romî ya!... Têlê bi dirih!...

Fêde nake. Axa Mezopotamya qet serê xwe na deynê... Bingeha wê li ser gotinê Rastemê Zal hatî ye danîn. Bi gurzê Bubê Guh Bi Pirç hatîyê dewisandin. Bi lorandina Ahmedê Xanî hatî ye himandin. Bi xwîna şehîda hatî ye avdan. Bi tovê sedsala hatî çandin û hunandin. Ne hejandina erdê, ne berq û toza Erebê çaq tazî çiqê tê dike. Ne lim lima nalê hespê Mongola, himhima Acema çîqe tê dike.

Axa kevnar e.

Şeql û reyhan e.

Mîna umman e.

Pêlê wê ha hatin ha hatin.

Serê xwe ha hilda ha hilda.

Wê hildê, wê hildê...
Wê rabê ser lepa.
Wê bimirê dewrana xapa.
Va hat xêr...
Wê bêt nîrê zêrîn...
Nêzik e, ne dur e.
Ya Hu Ra!...

X X

X

Li hêla Torê, kesê kû di nava gel de, deng da ye, bi hejmara telîyê desta ne. Yek ji wan kesê bi nav û deng Rifatê Kozî ye.

Îşev...

Şev nivê şevê...

Du rextê Mereşî, li newqa wî girêdayî, du rextê Toranî jî, mixalfe di ser milê wîn re li newqê girêdayî; xencera zîvî di kêleka wîn de, şazî barno di desta de; qunaxa sedek erd li pêşîya koma jin û mêra ye; çarçavî dibe, bi gavzerkê dilezîne. Bi qevastinê re, li dora xwe di nerê. Mêrê bê hesab dest na hilîne. Kuştîye... Mêranî pê na be. Desthilanîn, bi her kesê kû hêlik pêve daleqayî jî nabit. Mêranî muwe. Mîna muwê di nava mast de; ew kêlike, ku te dest hiland, xelas, bi dengê tivinga pêşî re, kû qerem li te ne hatin şikandin, te hêle xelaskir; kû te dest ne bire xwe, tu şilîhayî, çû, tu mirî, heye emrê te heye, ji lom û tunê xelkê tu xelas na be. Ma, êdî çik ji te herê jî, fêde nake. Nav bi duv te ket. Roja gonê, tim wê bêt hember te. Xelasî jê tune ye. Zimanê xelkê dirêje,

Nav ê gîdîtîyê zeliqandina lewate ye. Xelasî jê tune ye. Zimanê xelkê dirê je, felîte ye. Xerakirin zor e. Heya car din, salûwext jê re dive; avakirin zorûzehmet e. Bi qevza xwe re li çeprastê xwe di nerê, guh di berdê ser şevê. Şev qeraye, sekinî ye; qet ba na lebitê, xişpênek ji kû be, deng tê guhê wîn. Serê du seda jî, serê xwe nix-wînî erdê dike, guhê xwe di deynê ser ruwê erdê... Di-hisênê... Dengê jeepa romî ya, cemsa wan dûredûr tê an na ye. Zimmêna tekerê wan, guregura motorê wan, di kevê nava axê, pêl bi pêl bela dibe. Lorik lorik, xilqe xilqe, bi giranî... Deşt fere ye, raste, rut û duvdirêje... Qunaxa bîst kîlometra jî, kû erebe bi ser wan de bên, deng di nava axa Mezopotamya de, wê bi gihijê guhê Rifat. Axa Mezopotamya, dayîka ferxa ye. Lawê xwe di himênê. Zubizu rê na de dijmin. Dewrûqedîma de, wele-dê xwe ji berê xwe navêti ye. Kesî ne di ye, ne bu ye şahid. Axeke bi nanûxwê ye. Şax û rayê di nava axê de, bizewad û xîret in. Jîyana bi rumet, li ser bingeha sex-lemî hatî ava kirin. Tim himandî ye. Tim xwe lê pêça ye, tim lê xwedî derketîye. Rifat, pîrê van îşa ye. Dizanê, kengî, çi wextî, li kûderê romî hene; tên an nayên, jeep, cemse tên an nayên; di kû re diçin û tên, li kûde-rê disekinin. Qozî bi qozî, anîşk bi anîşk nas dike. Bi ser sehwa hidud ketî ye. Li kû dirunin, li kû disekinin, divekevin... Teva dinava mêjîyê xwe de mîna karenkarî ya ferz neqîş kirîye. Li xwe ferz didît; qedera însana, ya wî, ya kekê wî, ya kurê ciwamêra di destê wîn de bû. Xwe bê gotin disipartinê de. Her car, bê şik û zexelî, oxilma xwe bi cih û cuan dikir. Pirsê xwe ji kesê di nava esker û qereqola de dikir. Teva dostê qedîm bûn. Derew lê ne dikirin. Teva jî dizanîbûn çi karî dike. Lê di nava gel de, merivekî walatparêz û xatirnas bû. Qedrê wîn hebû.

Meşa kovîkî dikir. Diqevast... Dipekî... Kû lingê wî dadikete erdê, pêşî serê telîyê wî bi nerme diketin, piştir binê lingê wî. Heyveheyv li ser vê meşê sekinî. Di nava şuva de, li dera nu hatî cot kirin, di nava rez û werza de, di nava bexçê xwe de tim wilo di meşî. Ji xwer kiribu adet û tawîr. Xwe ne di şemirand... Kû bi ser rê diket, berî çendekî, bi şevûroj, serê xwe, çavê xwe, lingê xwe, destê xwe, dilê xwe, teva di hewisand. Bi mêjîyê xweve di kete cezwe... Di kete jîyana hal de... Qencûrind di nava laşê xwe de, di nava mêjîyê xwe de, di nava xwîna xwe de, di cemidand. Bo, neyê şemirandin, tu xeletî, tu şaşîtî ya neke.

Îşev, sekin ne dikete rihê wî. Bêhtir ji hercar diket û dirabû. Ji hêbetê xwedê, ji lom û gotinê netkesa, ji dilûmirada xwe dabuyê. Qewetî li kekê xwe û birazîyê xwe jî kiribu, bo qet seknê nedê rêwingî ye, heya îpekê xelas bikin. Qet!... Birazîyê xwe, Eyub, di nava rêwingî ya de, da meşandin; bo arikarî ya kesê bê taqet û qeremşikestî bike.

Eyub, mîna kurê wî, li ber dilê wî şêrîn bû. Xortekî, jîr û zîrek bû. Bi çîk û çelaq bû. Rifat ticcara berî wî ne dida deverê asê. Car cara bi xwer dibir; bo hînkirina danusitandinê, bo nasîna rê, hiduda, kesê nas... Hastiwê wî bi destê xwe distewand in. Mêjîyê wî, bi destê xwe xilmet dikir. Hurik hurik, bê derb û gotin; dida ber çavê wî, dida nava telîyên wî, dikira nava mêjîyê wî; bi kesa dida naskirin; dever, dikan û sûk, bazar û cihê firaxa nîşan dida. Hîni tevgera însana, civanokê ciwamêra di kir. Nava bajar û welata de, dida zanîn, çav vekirî di kir. Lê berê wî ne dida cihê asê; hidud û kemîn ne di da ne ber... Mîna hesinkerê evîndarê agir û hesin... Li

ber hesin û agir rune, hesin dehlîne nava agir qenc sor bike, derbixe, deynê ser sidan, bi çakuç, radorî wîn bikeve, lêbixe, bêjn û fesal bidîyê; bixe nava ava sar, semax û rewa bidîyê; bi sar û germî, tirs û reşî, birazîyê xwe dikir pola... Li gora zanîn û dilê xwe... Maldar bûn. Xwedî hatin û warîdat bûn. Xwedî cih û war bûn. Heya tibê bes... Lê çavê însanî, ti bike neke ji malê dinyayê têr nabe.

Malê dinyayê, qirêja desta ye.

Berîka kefen jî tune ye.

Kesî, malê vê dinyayê bi xwe re ne birîye dinya din.

Mal, bo rumetê baş e. Mal hefadê însanî be başa, ne kû însanî karkerê mal be.

Mal bo xwarin û jîyana xweş, qedandina ciwamêrekî baş e. Malê hilandî, bara mişka ye; kû mişk ne xwin, dibe bara zalima...

Lê, Rifatê Kozî, merivekî mîna xwe bû. Dîtîn, bawerî, jîyan, danûsitandina wî; ya bi xwe şexs bû. Kû dabaş dihat ser cilê, salifê serpêhatîya dest pê dikir heya dawî: Çav li derîya xwelî liserîya... Ev di got. Bingeha bîr û bawerî ya wîn bû. Felsefa jîyana wî ev bû. Bingeha jîyana xwe, seranser li ser vî esasî ava kiribu. Ne rojek dido, ne salek dido gihajtibu vê noqtê... Cambazîya kesê fermesun, hile û xapandina kesê diru, du ziman, pîrr dîtibun. Ew serpêhatîyê Rifat ne bi banqnota tîk kiryarî, ne ji pirtuka tîk xwendin. Jîyan û tevgera însana, çûnûhatina walatê xerîb, temahîya însana, melaqî, hile, cambazîya di xwîna însana de, bi dev nayê qal kirin, bi pê-nusê naye nivîsandin. Ne zimanê însanî dikarî wesifdan bide, ne xeberê di mêjîyê însanî de têra saloxdana wan tîştê dike.

Gotin û kirin; dîtin û gotin ji hev dure. Kesê ev gotin got, helbet tiştekan ji jîyanê dizanîbu. Helbet xebera wî ji tevgera însana hebû. Gotinê pêşîya bi sed sala, bi duset sala carekê tên gotin. Galgalê bingeha jîyanê ne.

Kû malê te hebe, tu karê bi serê qirşekî neke; tê bibe qajikê devê xelkê... "Heew mala te, filankes bitrê malê xwe ye, tolazîyê kû dike, kû tu bibîne...." Ev e!.. Devê xelkê jî ne doxîna merive kû yek dikaribe bişidîne. Tolazî bi jîyanê na be. Zor e!.. Kû mal hebe, tu kar bike, îcar tê bibe benikê devê xelkê. "Heew tew, çavê însanî encex ji axa sar têr bibe. Berîka kefen tune ye..."

Dinyake lewto ye....

Tu wiha bike xirabe...

Tu wiha bike kambaxe...

Ya baş ew bû, kû jin û mêr pirranîya wan ne xerîbê wê rê bûn. Her sal vî wextî diçune Bêrudê. Çar-pênc heyva kar dikirin. Car din di eynî cihê re, bi şunde divegerîyan. Exlebê wan, niv emrî bûn; çend xort hebûn, nujen bi ser rê diketin. Çend serspî jî di nava wan de hebûn... Jêhatî bûn, xort ne tanîne qama xwe. Mîna xortê çarde salî boq-boqa wan bû di rê de. Ne kuxtênek... Ne ay-uyek... Ne fişşênek... Qet deng ji wan derne diket. Bes xwiştêna ber linga bû. Gavê tirsê, gavê lezê bûn. Dera kû têre di meşîn şuv bû. Têr şartîlê axê bun. Pirranîya cara li wan şartîlê axê diterpilîn. Hin ji wan bi sîtîma ve diçune erdê. Zu dirabun. Hin ji şerma, hin ji mecburî... Di ber xwe de di kenîn. Hin bi halê xwe, hin bi hevalê xwe... Kesî ne diwêrabu hişkere bikene... Ne cihê metrozî û heneka bû. Kûtkûta dilê wan, bêhtir ji nefesa wan û terpterpa ber lingê wan dihat. Jina, çarîk û he-

mawî li dora dev û ruwê xwe pêça bûn; dawê xwe çikandibûn û didana pêşîya mêra. Şev reş bû... Mêr û jin, ji hev ne dihatin naskirin. Kesî dilê kesî oxilme ne dikir. Kî ditirse, kî na tirse... Kî di pelikêne, kî na pelikêne... Kî xof dike, kî nake... Lê, kesî kû ne tirsê di darê dinyayê de tune ye... Dîn xaric... Çi jin, çi mêr... Du gav in, du çav in, yek ziman e û yek dil... Di nava reşa şevê de, jin û mêra di berîya Nisêbînê de tirad bi hev re dikir. Rêya tirsê ye... Mirin, di ber te re, her gava kû ti tavêjê xwe nîşanî te dide... Mirin li duv te ye. Li pêşîya te ye. Di ser tere, di bin erdê de ye... Di nava lingê te de ye... Xwe nîşan dide. Bi çav zerkê li te di nere. Xeletîyek, şaşîtiyek qebul na ke. Kû şaşîti, xeletî li dor te dît, xelas. Wê li nav milê te suwar bibe. Qet, afu, burandin, xelas bun tune ye. Çavê tirsê pîse... Wey li wî kû bide pêşîya ê din.

Eyub, cêhil bu. Xeşîm û ne zan bû.

Lê jêhatî, jîr û zîrek bu.

Wekî pêşîya gotî: Kesê qenc, ji hêka xwe de jîr û qence. Eyub, di nava koma wan însana de; gih di bezî pêş, gih di bezî paş... Yekî kû lokme dabaye, terpilî baye, ketibaye, li cem wan hazir dibû. Pêve di zelikî... Arî dikir... Bi navtêdana, zirt û wesifdanê bo dilqewînîyê kû didana wan, qirika wîn zuwa dibu. Mihemed Seîd, tivinga xwe avêt bû ser mila xwe, di ber wan re di meşî. Ketibû neqeba rêwingîya û Nisêbînê... Du tişt dabûne ber çavê xwe: Yek, bo romî ya... Berî rêwingîya li wan biqewimêne, rêwingî ne kevin navbera wîn û esker... Dido, bo birayê xwe... Bi tivinga pêşî re, ataxîyê ji Rifat re bike. Paş mêr ew bû, giraniya himandina Rifat diket ser milê wîn de. Bi çavê ne şemirandinê ji tihêl ve, duredurî rêwingîya di meşî.

Şev, reşe!...

Çavê tirsê ye...

Gotin baqê nîska ye. Asil kêlîka qewamê ye. Kû qewimî, ev koma însana, weke kû ti nehka li kevir bixe, teva wê belawela bibin. Her kesî ji xwe re, her yekî bi deverekê de. Kes nikarê wan zemt bike. Ne yekî ji wan... Dê weledê xwe wê bavêje... Hidud e... Tirsê hidud, tirsê mirinê ye... Giran e... Yek bive neve tirsê dikevê dilê însanî... Tirsê ji tirsê mirinê girantî tune ye.

Mihemed Seîd, paşmêr bû. Xilaskirin û kuştina pêşmêr didestê paşmêr de ye. Divê ne li xwe, li pêşmêrê xwe guhdarî bike. Şer ticcarê ji paşve destê pê nakê. Pêşmêrê di devê deverê de ye, diçe se kemînê, diçe ser kozikê, berê pêşî bara wî e. Dive kû paşmêrê sê qet guhdarî pêşmêrê be. Talî jî, ew kesê pêş, kû diçe deverê, diçe ser kemînê û kozika, Rifat e. Rifatê Kozî, birayê wî e. Parçekê ji dilê wî e. Xafilîk, xeşîmîk, şaşîtikê bibe, dibe sebebê kuştina dilê xwe.

Zana bû.

Kevnare bû.

Heya tibe bes xwedî tecrûbe bû.

Nexasim di vî karî de. Jîyana wan bû. Ew serdor jî, mîna kefa mista xwe, qul bi qul, anîşk bi anîşk, tibare bi tibare, rizde bi rizde, kortik bi kortik û cokê avê, teva xweş nas dikirin. Kemîn li kû hene; kozikê û nijde li kû dehmê ne, romî li kû dehmê vedikevin; jeepê ji kuve tê, li kujan mesîlê pê de ronahîya wê tê xuyakirin?... Teva dizanîbû, nas dikir. Wî jî, birayê wî jî... Debora xwe bi devê şazî barnoyên xwe qezincê dikirin. Jîyan wilo nas kiribun. Ne wan, jîyanê ev rê dabu ber himbêza wan. Wan jî, jîyanê şermezarê ne kir. Abora wan, li ser mayîn

û devê tivingê bû, di nava têlê têr dirih de bû. Wext ev wext bû. Kom, nijde li ser eşîra ne ma bûn. Tirş û talan bubun eybûar. Mêranî, mêrxasî ketibu devê tivingê û nava mayîne dora wan têlkirî...

Mirin, reşka êvarî bû. Ji kuve, ji kujan anîşk û qeraxî, wê bêt û liqasî te bibit hunda ye. Çi wextî, li kû dehmê, li kîjan cihî ti û mirin tîqe tîqe serê we li hev din kevê kifş nabit. Kengî, li kuderê, kîjan gavê lingê te bikevê ser mayîne de û bi te de biteqê, ew jî hunda ye.

Hikumeta Tirkîye, ketibu dewsa Xwedê de. Romî û mayî jî melkemot... Dest li ser jîyana Kurda danî bûn. Erd û ol û tol ne bes bû; jîyana rojê, abora însanî bubu agirê semewat. Nan û qut ketibû navbera çaqê melkemot de. Çaqê pêşî mayî bû, ê din jî romî bûn. Îcar di destê Kurda de zor û kotek mabu.

Wan jî, bo nanê rojê, qutê salê zor û kotek dikir.

Hikumeta ked xwer ne bes bûn...

Melkemotê romî û mayîna ne bes bûn...

Ew bext reşê xayî zêdebuna ser kezebê bûn...

Erdeke hişk, azmanekî bilind... Ne hawar tê, ne rehm di dilê wan de heye. Ew xopana deşta binya Bagokê, kûr û dure... Ne latikek, ne devîkek, ne rizdeyek, ne kaşikek... Xaliqallah... Sitar tune ye... Kû şirildaqa romî ya da ser te, xilasbuna te nema. Di nava şewqa şirildaqê de, mîna kesê tazî, uryan, di nava şuvê de, tu mayî li rastê... Ayan beyan... Nexasim, ev koma însana... Bê lome!.. Dê weledê xwe wê bavêje. Kes li kesî nabe xwedî. Bes ew kesê çar gurçik kab diberdine erdê, bi kuştin, bi hiştin, sînga xwe didine ya melkemot û li ber xwe didin. Kû

mirin hat bêminetî ye. Kû Xwedê ferece da jî, mêranîya dîrokî ye.

Şer, her dem bê minetî ye.

Kes navê xwe, qenciya xwe û mêranî ya xwe na de kesî. Hawara merivê qaçaxçî tune ye. Ew û devê tivinga xwe ne. Heçî romî ne, dehbê bê ewle ne. Hov in... Li paş û pêş na nerin. Eyb û ar li cem wan tune... Xofa Xwedê, fedîbuna ebda di zikê wan de tune... Hawara wan jî giran e. Teva suwarê cemsa, jeepa ne. Qaçaxçî, zûbizû kûştinê nake. Li şun xwe dinerê... Sibe jî heye.

Li yek şewtê, bê sekin, li bayê bazê îpek xelas kirin.

Qet sekin nedan xwe, heya du sedê erda jî lezandin.

Rifat di pêşîya wan de, di kortikkê de runiştî bû. Heya gihane cem... Teva di kortikê de runandin.

Bi dengê bilind:

-Heya bi vir, bisilametî derbas bû. Ma ye lezeke din. Bêhna xwe berdîn. Rehet bin. Qet xof nekin.

Piştî xeberdana xwe, rahişte destê birazîyê xwe û çu cem kekê xwe...

Kekê wîn, neh deh gava li teref çog berdabu erdê. Her sê li hev runiştin.

Pêşî Rifat xeber da:

-Weke her car... Em, di wextê xwe de gihan. Kû ne Xwedê xerabike, silametî ye. Hindik ma... Têl du sedê qantira durî me ye. Kozika romî ya jî... Ev kojik, pirranîya cara vala ye. Lê ji nişkê de çênabe kû em herin. Pêşî ezê herim binerim.

Hê xeberdana wî xilas ne buyî, Mihemed Seid diji peyva wî derket:

-Na birayê min na!.. Ezê herim. Heya niha tu li pêş buyî, ez li paş; ji vir û ha de, tu li paş ez li pêş... Ev îş gere bi dorê be.

Rifat bi zirt:

-Hêdî, ne wextê pêş û paşa; kû em ji hev re melaqîya bikin.

Di jiyana xwe de; di hemberî kekê xwe de ev cara pêşî ye kû Rifat wisa xeber dide. Kekê wî jî, birazîyê wî jî man dileheyî. Herduwan jî dizanîbû kû bo, rê nedê wan qutbir lê da.

Rifat parîkî sekînî. Li gotina xwe poşman bû, lê ji devê wî derket. Bo wan bi sekînê ne, bexişandina xwe hişta xilaseka rê.

-Tijî dizanê kû ez çêtir ji te kozikê nas dikim. Sedema herî mezin eve: Kû em her sê jî bîn kuştin dive ev kes îşev derbas bibin. Qenc guhê xwe bidin gotinê min; kû romî di kozikê de bin, ezê wan êsîr bigirim. Heya kû hun derbasbin. Dawî, kekê min bila li min vegeê, emê wan jî bixwer derbasî rexê din bikin û berdî. Yan jî çekê wan bavêjin nava mayîna.

Eyub xwe avêtê holê:

-Apo, kû ew te bibînîn?..

Rifat destê xwe danî ser milê birazîyê xwe.

-Birazî, hinga ya ez, yan jî ew... Lê xeyala meke, coka avê ye, kû ne Xwedê xerabike, çênabe min bibînîn. Durî aqila ye. Xweş dizanim kû, cih jî, hê ne guhertine. Şevê din, karwanê Seyîdê Kevsengê di vê noqtê re derbasbun.

Milê wîn guvaşt:

-Birazî, apê te, bavê te pîrr çarşembê reşî wilo derbas-kirine. Rêya wê jî heye. Kû Xwedê ferece bide, tê bibî-ne. Lê, dive ti pîrr jêhatî be. Kû hun ketin nava mayîna de, qet du kesa di ber hev re ne meşî ne. Bavê te wê rê şanî we bide. Ji ser rêçîkê ne meyilin. Gavik nabe dido... Emanet emanet... Mayin, ne berê kor e... Di kesî na burê. Mirin e... Dengê xopanê, bê xwîn naye der. Vê xweş dizanibe. Here nava wan, yeko yeko ji wan re bibêjê... Du car sê car li wan vegere... Heya kû qanc fam bikin... Ya sitaaar, yek ji wan bi meylê, lingê xwe beletewş baveje, em teva çun. Bi peqandina mayinê re, ev însan, mîna kûlmozê, her yekî bi deverekê de wê baz bidin, yek ji wan sax na mîne. Bê çawa gur di kevê nava pez de, her yekî bi deverekê de di revin, wê wisa çê bibe... Xweş bi wan bide fam kirin. Ji wan re hêdî hêdî, û bi lewnê kû min ji tere got bêje. Da zanibin dabaş çî ye. Rêçîk, geya tê de tune ye. Alîyê mayîna geya pîrre, bi ser serê suwara dikevê... Ev karê te, rabe here nav wan...

Kû Eyub ji cem wan rabu, her du bira ber bi milê çapê lezandin. Li duv hev, tewandî, herikîn... Şewteke baş çûn. Hidud, ji alî Nisêbînê dirêjî Cizîrê dibu. Noqta kû wî lê bixin, hemberî wan bû. Wan berê xwe da Cizîrê... Bo li kozîkê bi fitilin. Du çavî di kozîkê de hebun. Çavîk li Bagokê di nerî, ya din li Nisêbînê... Ji alî Cizîrê, coka avê di hata ber kozîkê û lê di fitilî; ji cem kozîkê, bi alî Bagokê de dişeqitî...

Ji newqê pê de tewandî, bi lezeke gurkî qedereke baş çun. Sekinîn, bê gotin, dîse meşîn. Wê carê berê wan rastûrê li hidud bû. Qet ne sekinîn, heya kû gihane têlê. Coka avê di ber têlê re dirêj dibu. Heya bi ber kozîka romî ya. Ket-

in coka avê, runiştin. Parîkî bêhna xwe berdan. Bê gotin, Tivingê xwe oxilme kirin, fişek di devê tivingê de bû, libka emniyetê daxistin. Bê deng... Kû gihane ber hidud, destê wan ji xwe re di lebitî. Refleks û hereket, lept teva xuzeyî bû. Bê kontrol... Ji xwe re... Rifat li pêş, Kekê wî, di se li paş, bi zikve dirêjbûn. Ber bi kozikê herikîn. Mîna du mara li hev dihatin pêçan û dirêj dibun. Heya gihiştine nîşana xwe. Nîşan kêlika kevirekî dirêj bû. Ji ber têlê, dirêjî nava cokê dibû. Rifat destê xwe hêdika danî ser. Bi şîranî... Nerme nerme li ser gerand. Mîna zaroka di pêçekê de, pêşa dibû. Bi evîndarîyeke giring. Nîşanî ya navbera wan û mirinê bû... Ew, ji mirinê, ji şaşîtiyê, ji xeletiyê dûr dikirin. Hawara wan, sekna wan, sitara wan kevir bû. Bê galgal, bê gazine, bê sergiranî karê xwe tanî cî. Ne zikreşî li dor kevir habû, ne bêbextî û ne temayî ya dinyayê. Sekinîn... Rifat çawa kete cokê, di nivê cokê de çarmêrkî runişt, berê xwe da azmên, li sitêrika nerî... Destê xwe dirêjî erdê kir... Di navbera azmên û erdê de fikirî... Navbera stêrika û axê de... Kûr û dûr e... Mista xwe tejî ax kir, bire ber pozê xwe, bêhn kir. Zimanê xwe li axê da, bire devê xwe. Bêhna axê xweşe... Behna jîyana tuj û tehl û sedtamî, hînik û germ û sexlam jê dihat. Bêhna germa rojê; bêhna kedê; axa kû hişk bu ye, bi hînkaya evarî re, tevlî şilaya şevê buye. Şilayî, rewa ye. Têhna xuliqandinê ye... Pişkivandina pişkoka jîyanê ye. Dendika di nava rewa erdê de, bi wê şilayî ya êvarî û germa di nava axê de têhne dide. Çirîsk dide. Çirîska jîyanê... Dilkê wê hêdî hêdî lê dixe. Xuze, şev û roj xebatê dike. Sekin jê re tune ye. Xebata xuzeyî jîyan e, zêdebûn e... Tim ava dike... Ra û şax, ber bi hebun û rabunê li hev di pêçê. Di nava tevgera jîyanê de, rê dide: di nava ax û avê de di hunê. Hevîrê têr haveyn... Haveynê gihiştinê... Hazîriya şevê, pêçan û hunandin e. Tav û germa kû ji rojê sitandîye, heyra hînkaya berê sibehî di

nava zikê xwe de; bi çakuç û sidan, bi kevir û heste, bi rende û birek, bi das û bîvir, bi kolan û xepardin, bi kesax û aşêf, bi seyifandin û liqat, bi cot û cotbar, bi xerca dilê jîyanê hazir dike. heya fecera sibehî, kû roj hilat ber qebelî rojê dike.

Çavên Ra...

Çavên Hu... Bruska xulqetê... Erd û av û roj...

Sê perçê xulqetê... A... Hu... Ra....

Erd û av, hevîr e... Roj, haveyn e, tirs dike... Di nava xerca xwe de li hev dixê, kal û bal dike... Xerca germ û sar... Pêl û kal dike... Şêrîn û tirs dike...

Rifat, destê xwe dirêjî Mihemed Seîd kir. Destê hev girtin, guvaştin. Tevzînokê germê, evîndarî ya biratîyê di nava rayê laşê wan de çûn û hatin. Gîrîzonek bi laşê wan ket. Qewl ev bû: Rifat wî herê nêjî kozikê, heya deh metro yan... Guh berdê ser kozikê, kû vala be, bê tirs, wî herê kozike; kû ne vala be, dengê kuxtêna wan, dengê xultemilta wan wê bêt... Kesê romî di kozikê de, şev nivê şevê, li ber hidudê Cerihê, ne wêrê bê deng bi mêne. Kû ne razê... Çavê tirsê ye... Xofa qaçaxçîya di dilê wan de heye. Pîrr ciwanikê romî, bi tabut teskere sitandibun. Bi dengê bilind xeber didin, car cara di kuxîn, car cara distrênin, bo qaçaxçî dengê wan bikin, rêya xwe ji ser wan biguherin. Rifat, qerara xwe dabu, kû xultumilta wan be, wî hêriş bike ser wan... Kuştin be jî, ferece na de wan... Yan vê xwe bide kuştin yan jî, wan êsir bigire. Heye kû razayî bin jî. Ew jî birayê tinebunê ye. Ferq nake. Ya xeter!... Ya pîss!... Ya kû, Rifat jê di pelikand, kû mîza hina ji wan, an, gûwê wan segbava be, derkevin destavê... Ew xerabe... Ya hunda, ya durî çav ew e. Ê din teva sehlin...

Reştari ye.

Ji sê bosta û wir de kes ber lingê xwe na bîne.

Kû ne xewasê xewasa bit, di şevê wilo de kes ceger nake xwe bide ser kozikê romî ya. Mal xerabun e. Kuştin e. Mirin e!.. Çune ser hundabunê ye...

Her du jî, xewasê şevê bûn. Reş, bo wan, suriha Hemedanê, ya heft rengî bû. Zirhê çil û sê avî bû; bi ziha ga masîya, têr tav, hişk buyî, şidandî bu. Dewsa wan sivik e.. Hîn bune... Qet deng dernaxin. Cih te, kû qet nefesê na din, na sitînin. Cih te kû dibine lepik. Cih te kû dikevina nava xetê şuva cotkirî... Cih te, kû di kortik û mesîla de dibine kuç û tilmikê axê... Cemadana reş belek li ber dev û pozê wan pêçayî ye. Hilma wan der tê, lê jîyanê na bîne. Bo xîsêna dev û pozê wan jî newê, çawa hilmê dertêxin, dîse di qurpînin.

Di nava ummana reşê de, masîyê bê çeng û per in. Sobahiya destlepkê dikin. Kûr e, giran e... Tuj e, tehl e... Şewata agirê semewate. Ne reş di lebite, ne beden. Ne ba, li pêlê reşê dixê, ne lepta wan... Bune parçek ji ê şevreşê. Di herikin, na meşin. Di meşin lê, lingê wan ne li ser erdê ne. Di firin, çeng tune ne, ne li hewayê ne. Qasê ketin coka avê de, destê xwe li hev dan. Rê ya çûn û ne hatinê bû. Çûn û ne hatin; hatin û ne dîtîn... Bi hev re di jîn... Cok, bê av bû. Salek herê yek na, dora wan şuva û çandinî ya pembû dihat. Îsal, ne dora pembû ye. Tim, çawa destê xwe li hev guvaştin û berdan, destê wan ji xwe re li ser şazî barnowan diçûn û dihat. Xwe liser wan dirêj dikirin, di bin xwe de, oxilma talî dikirin. Liqas çavmiçkê îşê xwe xilas dikirin. Îşev jî, wisa çê bû. Li duv hev, bi çalepkê çûn. Qedereke baş... Rifat dîse li pêş e... Sekinî... Destê xwe dirêjkire kekê

xwe, runand, bi evîndarî guvaşt û berda bû. Car din destê xwe li ê kekê xwe peça û hêdîka berda. Xwe dirêj kir. Bi zikve, mîna mar herikî. Di bû gulok û diverîşiya. Çawa ew bi rê ket, dilê Mihamed Seid qêbil neda, hurik hurik li duv çû. Rifat, mîna pilingê ber bi nêçîra xwe here, reş li xwe pêça û hunda bû. Çavê wîn li kozikê ye. Di cara xwe divezîland, bê pêjin di ma. Guhdarî dikir. Hezrê kû wî dikir, gere kozik ber çav bubuwane. Xuya ne dikir. Dilê wî, hinek lê da. Çavê xwe guvaştin, du car, sê cara miçûbal kir, car din nerî... Tiştêkî xuya nekir. Guh pêlî serdorên xwe kir, tiştêkî his ne kir. Car din vezîliha, ya duduwan, tilmik der ket ber pozê wîn. Ew bû lê ne qelipt. Gihaştibu rex. Romîyek ji wan serê xwe bê hemd derxistiba ye der, wê ew bidîtaye. Destê xwe da tilmik. Kozik, hinek di bin erdê de kolabun, çend kevir û kîsê teji ax danîbun dora wê, ser bi dar û kirşika girtibun. Bê hemdî xwe bere paş bû. Bi hêrz, serê xwe li taqê cokê da. Heyf dan xwe. Eyb û arî dan xwe, qaherî, ji xwe... Di dilê xwe de: Çawa ez Rifatê Kozî bim, ji ber sê-çar romîyê qun bi riqa bi tirsim, xof bikim û berepaş bibim. Xofa wan bikevê dilê min de. Heyf e!.. Şerm e!.. Hê bêhtir xwe bi baskî kozikê de kişand. Giha ber kozikê. Car din destê xwe dayê. Guhê xwe danî ser qeraxê kozikê. Lê hisand. Hurik hurik danûsitandina nefesa romîya di hat. Ketibune xewa şêrîn de... Dilê wî çarpîne lê dida. Hin ji kêfa, hin ji tirsê... Ya dawî ye. Ma kêlik... Mêranî û mirin, xilasek û kuştin, bi hev re... Çavê mirin û serfirazîyê bi hev re di çirisîne. Her du, di kozikê de ne. Destê xwe dirêj bike, wê mirinê jî, felatê jî zemt bike.

Mihamed Seid, nefesa xwe girtîye, çavê xwe hurik kirine, li birayê xwe û serdora di nere. Berê şazî barno da

ye kozikê. Tilha wî li ser lingikê wê ye. Kû xiştênek bêt, kuxtênek bêt, wê bi qewimênê. Kû xiştên ya marmarokê jî be, dê weledê xwe wê bavêjê. Dilê wî qêbil ne dida, xwe di cihê xwe de ne digirt. Hurik hurik, ew jî ber bi kozikê çu. Hew dikarîbu xwe... Piştî, birayê wîn, ji cem bû rast, destava romî ya hat bîra wîn. Çi dibe, çi na be... Ji nişkê de, serê Rifat û romî ya, tîqe tîqe li qasî hev bibe, xwe zer bikin hevdin... Romîyê din jî, li wan bêne der, kesek wan ji lapê romî ya xelas nake. Di nava van xeyala de, li ser tihêlekê diçe.

Rifat, xweş li wan guhdarî kir. Sê kes bûn. Di cihê xwe de, kaboka rastê da ye qeraxa cokê, ya din di bin de ye. Xwe qenc tewandî ye. Mîna şêrê li ber nêçîra xwe veketî. Kû yek ji wan bi lebitê, wê xwe çendî ser wan bike. Devê şazî barno, hedîka direjî devê kozikê kir. Sekinî... Nefesê ne dide ne disitînê... Destê xwe avête xencera xwe, ew jî, carek din oxilme kir. Di wê kêlikê de, yek ji romîya qulîbê ser tihêla din. Himmên pê ket. Rifat, pêre pêre xwe zer kire devê kozikê. Tiving kira nava wan de. Dengê xwe kir. Dengê Rifat pêle li reşa şevê dan. Pêl li pêla din, duv hev ketin û mezin bûn.

-Sakin kîpîrdamayîn!...

Bi Tirkî xeber da:

-Ne lebitin, mi hun kuştin.

-Yek ji we ne lebitin. Meyzekin haal!..

-Kesê bi lebitê mirî ye...

Hê gotinê Rifat di devê wîn de, Mihemed Seid li cem sekinî.

Xweş bi Tirkî nizanîbû. Devê tivingê xiste nava wan de û bi Kurdîya gewr dengê xwe kir. Dengê wî qalin bû.

Xeberê wîn jî giran bûn, bi tiqul bûn... Kû dengê xwe dikir, mêr di cihê xwe de direcifin.

-Kuroo me lebitin...

-Segbavê pîss, deng mekin...

-Ê kû bi lebitê mirî ye...

-Meyzeke haa!..

Gotina dawî bi Tirkî ji devê wî derket:

-Kıpırdamayın ulan eşşekoğlı eşşek, haaa!..

Rifat li kekê xwe hilat:

-Sixêf ne ê ciwamêra ne.

Romî şilihan. Lal bûn... Bê ziman bûn... Devê wan li hev herbilî, hew dizanîbûn çî bêjin. Du zerezîpê zilama, şev nivê şevê di nava çol û çîya de, devê tivingê xwe serjêrî nava wan kiribun û bi zirt bi ser wan dihilketin. Mefera romî ya ma, kû destê xwe hildin. Yekî di nava wan de xeberek tenê ji devê xwe derxist...

Ji kêlîka pêşîde ew, ji ziman ne ketibû. Şaşîtiya xwe jî, zu, ji ser xwe avêt. Bo ferecê ew xeber got. Got û key-sa xwe, li rahiştina tivingê xweş kir. Zanîbû, destê xwe dirêj bike jî, di reşê de xweş nayê ditîn.

-Teslîim!!...

Ê din devê wan li hev herbilî. Lal bûn...

-He, hee, hebe be!...

-Aaa, bbeee... Aaa!...

-Tee... Sss... Lee...

Gotinek din ji wan çê ne bu.

Ê kû, xeber ji devê wî derket, ji nişkê de xwe çendkire tivinga xwe.

Mihemed Seid pê ve da. Ne merdî nekir, devê tivingê hilweşandîyê de. Devê tivingê tujikî, li devê wî da. Borî ya mirinê kete devê wî. Bû teqe teqa dinanê wî.

Bi Tirkî xeber gotin:

-Şaqa mi yapıyoruz ulan eşsek oğlî eşsek.

Bi lepta wîn re, Rifat, li her duwê din jî qewimand. Devê tivingê, ji koratî ve li wan da. Heya kû qenc ji mêranî xistin. Di wê navê re, Rifat destê xwe dirêjî tivingê wan kir. Her sê tiving, ji nava wan kişandin, wekî sê dara zer kirin wîyalî. Cemedana sutiwê xwe vekir, qenc ba da. Yeko yeko ji kozikê derxistin, dest û lingê wan Hişk girêdan. Her sê bi hev ve qenc şidandin. Cemedana kekê xwe û dismalka wîn jî, jê sitand. Bi dismalka, devê wan qenc girêda. Her sê romî, mîna sê qurmê dara, avêtin coka avê. Kû karê xwe xelaskir, li kekê xwe hilat.

-Zu, gîdî, kêlikê berî kêlike xeberê bide Eyub.

Mihemed Seid, dirêjî nava reşê bû. Hê Mihemed Seid di nava reşê de hunda ne buyî, tîrêja çavikê jeepê, mîna zihayê Şikrîyê Emîn, ji alî Nisêbînê ve xuya kir. Mihemed Seid gav sist kirin, li şewqê nerî. Car din xwe şidand.

Eyub çavê xwe berdabune nava reşê. Rebenê xwedê çiqas dîr di nerî, çar gav encex pêşîya xwe di dît.

Bavê wî dengê xwe kir:

-Eyub, Lawê min zû... Werin...

Bi dengê Mihemed Seid re gurrênî li komê ket. Wey li wî kû ber bi hidud baz bide.

Ew baz didin, tîrêja şewqa jeepê ber bi wan, mîna ava

bêjî û tayê mirinê bi hêrz tê.

Çawa berê çavikê jeepê li wan ket, tamtaretê koma însana ber çavê zabit ket. Serê xwe derxiste der ve, rabû şipê. Bi zirt li şifêr hilat, bi ser hilbu û got: "Pêl gazê bike.", lingê xwe danî ser pêlika jêr; fişek ajote devê reşaşê, berranî reşand. Xumênî bi berîyê ket. Dûr bû. Dizanî bû, kû ber na gihijine koma însana; lê xebera romî ya pê dixist. Kû razayî bin, bo rabin, şiyar bibin, li qaçaxçiyên bi qewimênin. Romî ji pêş, ew, ji paş de; rêwingî dinava du agira de bimînîn. Navbera du agir de, wan teva bigire, yan teva bikuje. Mefera bazdanê qet nebînîn. Armanc ev bû... Hidud e, çavê tirsê ye, dengê reşaşê bikevê guhê wan, şewqa jeepê bide ser wan, bive neve tirs wê bikevê dilê wan, şaş bibin. Rexek mayin, rexe romî, rexê din ew; navbera sêkuçka agir de xela-sîya wan tune ye.

Teqe teqa reşaşê şevreşa şevê tev û lev da.

Dengek bu hezar deng. Li yek şewtê cerculê xwe valakir.

Bi dengê reşaşê re, şelq li koma rêwingîya ket. Eyub dêhnê xwe dayê kû ji hev qetîyan, bê serî, ji korî de bi ser hidud de baz didin. Lingê xwe li piştê quna xwe dan, bilez li pêşîya wan zivîrî. Zanîbû, çavê tirsê ye, wê teva xwe, dinava mayina werkin.

Bi zirt dengê xwe li wan kir. Xwe çendkire ê pêşî, bi hêrz dehf lê da. Ê pêşî, bere paş çû, çû çû, li ê pey xwe ket, her du bi hev re gêrî erdê bûn. Ê pey wan hatin lê ne sekinîn, dengê wî jî nekirin guhê xwe; bazî pêşîya wan jî, ê kû gihayê zerî erdê kir, ê kû gihayê dehf da bi paş de. Hin, wan daf dide, hin bi zirt ser wan hildikevê. Çi yekê heliqand li sitana piştê dirêj bû.

-Ne tirsin. Ne tirsin... Hê dur in. Jeep bîst kîlometra ji me dure, hunê mala xwe jî ya me jî xerabikin. Hêdî, hêdî, bê tirs, kes li pêşîya me tune, rê vekirîye. Parîkî bi semax bin. Ne eyb û ar e kû hun wilo dev ji hevalê xwe digerin, her kesî ji xweremere baz didin. Qey hun nizanin kû mayin li pêşî ya we seranser raxistîne. Bi sekinin, lê kesê kû ji min buburê, ezê fişekê di qafê wîn de bipeqînim.

Eyub li ber xwe û sekna wan dida. Bi vir de dibezî yek di sekinand, bi dera din de dibazî, yek gêrî erdê dikir. Bavê wîn gihişte cem. Wî jî nemerdî ne kir. Hin bi zirt hin bi nermî li wan hilat.

-Qet xeyala mekin. Ne nerin li teqêna reşşa romî ya Qunaxa rojekê ji me dur in. Rifat asker safî kir, teva teslîm girtin, hişk girêdan. Xeyala mekin, xeyala mekin. Bi semax û bê tirs bin. Gelek çû hindik ma...

Tu ji kêre dibêjê... Kes na hisênê. Dengê reşşê kete guhê wan, şewqa çavikê jeepê dîtîn... Kezeb li wan qetîyan. Wey li wî kû ber bi têlê bazbide. Ew jî baş bû, kû berepaş baz ne dan. Kû berepaş bazbidane, ya kambax ew bû. Dešta rast û fere; şev reş, koma însana belawela bubwane, wî kê bigirin, bi sekinînîn, kê ne sekinînîn!...

Ru reşîya mezin û hetîketî...

Wî jî dafek li yekî duduwan da û bakir:

-Bidin duv min, li hev xwedî derkevin. Ne pirr ma. Gelek çu hindik ma. Werin, werin, bidin pey min, lez bikin, zu, zu, werin. Ha bavê kê, haa!...

Li dengê wan, Rifat çu, gihişte cem wan. Dengê xwe kir:
-Parîkî lingê xwe bilebitînin. Qet xeyala mekin. Ez bavê
Alî û Şêro me. Pêşîya we buyê rêya gundê we... Bê tirs
û xof bikevin duv hevdin. Ji duv hev qutnebin, yek bi
yek... Cot bi cot ne meşin, cot bi cot ne kevin şopa
nava mayina. Emanet. Şopê bernedin heya du sed erd.
Yek bi yek... Ha bevê kê, lez bikin. Yek bi yek... Bê
tirs, pêşîya we valaye. Qet xeyala mekin. Ne nerin li
şawşawa van segbava... Zirtê vala ne... Ne jeep bi tenê,
qolordu ya Diyabekrê bi ser apê Eyub de be xeyala ne
kin. Ne xeme... Qet xeyala mekin. Ha bavê kê... Bê hey-
dênî... Li duv hevdin... Yeko yeko...

Tîr ji kevan derketi bû. Bê his û deng, nema xêr dikir.
Romîyê kozikê safî kiribun, jeep û cemsê bi şunde tên ji
sed û yek bavê xwe de bê minet bun.

Rifat dengê xwe bilind kir, gazî kekê xwe kir:

-Kekê Mihemed Seîd, bila xof ne keve dilê te, bi serê
teyî şêrîn kim, a niha wekî kû davata birazîyê min Eyup
li dara. Ber ji devê tivingê derket. Roja qewamê ye. Em
û vî zabitê Tirka, emê du kaba ji hevdin re hildin. Ya
xwedê wê bide dîya wîn, yan jî dayîka me. Îşev hey
dayîka yekî ji ma wê jarê dilo bibeje. Ha heyran ha!...
Lingê xwe bi lebitênin. Da hun ne kevin nava pîyê me.
Lez bikin...

Giha cem Eyub, destê xwe li nav milê wî da.

-Min çavê te xwaro, bexê ji berana... Çavê min li paş
na mîne... Tê malbata me li ser linga bi sekinînê. Xwe-
dê emrê te direj bike. Kû Xwedê rihê Apê te nastîne,
ezê zabitê Tirka bi gorî serê te bikim. Îşev, ne dûr...
Niha û saete ke din.

Lima lima û xuma xuma reşaşa Zabit qut ne dibu.
Tîrêja çavikê jeepê gih li erdê dirêj dibu, gih berê xwe
dida azmana. Şevreşk, mîna şurê bruskê di qelaşt...

Mihemed Seid, peşî ber ne da. Di got û di meşî. Giha
cem têlê, têl bi qudaxa tivingê dewisand, bi zac û him-
met lingê xwe danî ser têlê û bi zac pêlê kir. Têl bi
erdê ve zeliqand. Ê kû hat, şop şanî da.

-Eve şop... Li yek xurê, rast, heya hun bigihijine bestê...
Kû hun gihan bestê, runin. Ewder xilaseke. Emanet û
qîyamet ne meyilin. Dora şopikê teva mayinin, mîna şe-
beşê Mihalmîya sipartî hev in. Meyzekin ha!... Emanet,
emanet, şopikê bernedîn. Li duv hev, qet ne sekinin,
heya bestê. Ne dur e, du sed erd in. Kû hun gihane
bestê xelas, li kêfa dilê xwe runin.

Devê wî ne diket hev din. Divabu kêlikê berî kêlikê wan
xilas bike, bo arîkarîya birayê xwe bike. Zabit bê îma-
nekî însana ye. Ocaxa pirr kesa ji darê dinyayê tefandi-
ye. Zalim bu, xof ne dikete dilê wî. Ev salek, sal û ni-
vek qirra qaçaxçîya anî bu.

Kesê bin têlê diket di hejmart.

Hejmara bîst û yekê teqêna şazî barno ya Rifat hat.
Bala xwe dayê; şun teqêna tivingê de dengê Rifat ne hat.
Ne qabil bû, piştî wan gotinê beranî kû gotin, jeep bi-
gihijiyê, dengê xwe bike. Bê deng, bê zirt li zabit na
qewimêne. Kû deng ne hat, dizanîbu, kû jeep hê dure.
hemberî xurêna reşaşê, wî jî dengê xwe kir. Va ez li vir
im. Fermo were ser sifra cengê. Şêr û kitik îşev wê
kifş bibe. Bersiva wîn dida. Da hişê xwe; çima wisa
dike, rêwingî, bêje xelas bûn, bo çi ne li duv wan e, da

em jî herin. Da ruwê xwe. Zirt kir, lê bu eks û înyat. Bavo, ev ne rîya eks û înyatê ye. Rêyeke lewto ye. Rêyeke bi teşqele ye.

Rê, şunde kezî kurê...

Dehnê xwe da jeepê, rast û rê bi ser wan de dihat.

Di ber xwe de:

-Ev segbav çi agirê semewate. jeep rastûrê ajote ser me.

Dengê xwe li wan dike û qewêtîya xwe ji bîr nake.

Berî salekê kû ev zabit hatibû Nisêbînê. Roja kû lingê wî kete Nisêbînê û vir de, bu ye melkemotê hidud. Xof ne dikete dilê wî. Jeep rast û rê tajote ser qaçaxçîyan.

Jeep nêzî wan bû.

Kete hikmê tivingê.

Da ye nava şuva, di rabe, di rune, li vir û dera din di keve û rast tê ser wan.

Rifat şipê di fişeke din li ser danîn. Kab berda erdê, berê şazî barno da çavê jeepê. Zanîbu, segbavê dora Aydinê wê rastûrê bajo ser wan. Di ber xwe de sixefek dido kirin, silma tivingê bi zac lê quliband, fişeka si-sîyan ajota devê tivingê; rabu ser xwe, dengê xwe kir.

-Te mala gelek kurebava xera kir. Hê te hêlikê reş di ser serê xwe re ne dîtîne. Tu, bi fiqrûfeqira alimîye. Kû xwedê bê erê, îşev, ezê pozê te bifirkînim. Da heya emre te û bavê te hebe, kû ti îşev ji bîr nekê.

Xebera wîn di devê wî de, ji tihêla wîn, di derba teqêne

demañê hat. Teq teq... Sekinî... Ne bu ya sisîyan... Nerî kû Eyub ber bi jeepe di çe, demañça wîn di destê wîn de ye.

Rifat aciz bû.

Çi gotibuyê, wîn çi dikir.

Ev ne îşê wî ye.

Gere bi îşê xwe bilebike...

Lê hilat:

-Kuçik, vegere, tê bi kude herê. Vegere cem rêwingîya. Min çi got te, tu çi dike. Bileeezz!... Niha mîna pezê bê şivan nizanin çi bikin. Zu, her cem wan...

Eyub xwe limêranî danî.

-Apo, ezê çawa te tenê bihêlim û herim?

Rifat bi ser hilbû:

-Ez dibêjime te zuu... Here bigihija wan, da ji hev din ne qetin. Lezke, lezkeee!..

Eyub, berepaş çu. Di gav avêtin dîse sekinî.

Rifat dêhnê xwe dayê kû birazîyê wî naçe.

Bilez çu cem.

Kab berda erdê, hin şerê xwe kir, hin xeber dida:

-Lawo here. Ne jeep tenê; bêlukek esker nikarê bi apê te. Bîya min bike. Ew îşe kû ti pêk bîne ji vî şerê min û bavê te zor tir e. Barê ser milê te, ji ê me girantir e. Ti zane kû emanetê xelkê li nav milê du xorta ji wan e. Yek ji wan finasekî bi emanetê xwe bike emê çi bêjin dostê xwe. Her, bîya min bike... Ne kû em xelas ne bu ne; ev segbav îşev ketîye derbê, ezê pozê wîn xweş û qenc bifirkînim. Ezê, di nava axa kû bi destê kevnepe-resta, kedxweran hatî perçe kir in, wîna li gora dilê

xwe bi gevizînîm. Êşa van segbava pirr daye ser dilê min. Ev segbav ketîya xwîna gelek Kurda. Tu, bi rê keve, ev îşê apê te ye.

Dengê Mihamed Seidê Kozî hat:

-Werin îcar, hûn xezeba xwedê dixwazin. Kes ne ma. Rêwingî çun, rêzan man. Kesî ev tişt li darê dinyayê ne dîtî ye, ne bihistî ye... Hûn şerê çi dikin?

Eyub li dengê bavê xwe çû. Li bayê bazê gihişte ber têlê.

Rifat, bi teqêna tivinga xwe re di ber xwe de got:

-Ev şerê namusê ye. Qey heya mirinê em ê ji bo, nan bibezin? Îşev jî, bila şerê me ji bo namusê bit.

Eyub çawa giha cem bavê xwe, gotinê apê xwe teva jêr gotin.

Bavê wîn serê xwe hejand:

-Lawê min, gotina apê te û serê wîn yeke. Got, xelas. Heya çiqqê di wî segbavî neke, hewya wîn di bin stuna azmên de çê na be. Here bigihije wan ciwamêra, li bestê bi sekinin, bêhna xwe berdin. Wan car din bi hejmêre. Pêncî û şeş kes in. Sed tifaqê dinyayê hene, min hejmartin, lê heye kû ez şaş bubim. Çavê tirsê û lezê bû... Car din binere. Ezê herim cem Apê te... Kû ez dikaribim wîna bênim başa, nikaribim jî, ezê şerê xwe bikim. Ji alîkî ve heqlî ye. Segbavê zabit mala pirr însanê Kurd xera kirîye. Meyze ha, emanet emanet, şop eve, virde, wirde nere. Rast heya kû te têla din jî xelas kir, êdî tu serbestî.

Mihemed Seid, qeherî, lê ne hişt Kurê wîn tê bine der. Xezebe!.. Rifat, îşev xezebê dixwazê. Xwedê çêbike... Ya

Hu, sitar ji ba te... Di ber xwe de, dest bi dia û hawara şêx û mişayixa kir. Kelkerm bu Rifat. Bi kelgermî, şer bi dijmina re çê na be. Şerê, dijmin û neyaran, bi nermî û salûwext, durûdirêj jêre dive.

Eyup kete şopa nava mayina û bazî.

Mihamed Seîdê Kozî, lingê xwe ji ser têlê hilda, ji cih, şipê berê şazî barnova xwe da şewqa jeepê.

Bi teqêna fişeka pêşî re dengê xwe kir:

-Ho!... Ho!... Ho!.. Ez bavê Eyub im, Lawê tirko, em Kozî ne, xwedî sozî ne; ji me re dibêjin beranê bozî ne... Mînaya lawo te qet nav û dengê me ne bihîstîye. Dest hilêne lo birawo, ez hatim.

Rifat lê vegerand:

-Derba kûştinê!... Derba Kûştinê!... Bila dilê te bi vî segbavî ne şewitê... Mala gelek kurebava xera kirîye. Jî-nê ciwamêra hiştine bî, zarokê wan hiştine sêwî. Şev şeva me ye. Emê heyfa topa li ser payîtexta Hevêrka jî hilînin. Dest hilê bavê mino. Dest hilê. Derba mirinê, derba kuştinê. Atlayîyê qet me de wan.

Xumênî bi berîya binya Bagokê ket. Ji dengê tivinga, ji dengê reşaşê, dê weladê xwe avêt.

Car din Birrênî bi Mihemed Seid ket:

-Heey, hooo!... Lo birawo, te berî niha gote min, daweta Eyub li dare. Îcar dahol zirna dike bare bare... Îşev raqsa dilê min û te ye. Bi çarpîne emê hernê de, na wela raqsa Midyad kî, ji mila de, şipê... Demudewranê Şemunê Henê Heydo û Elîkê Battê û Hiseynê Ferho; li serê qesra Tinatê, şipê, şipê, ha bavê min; Haa!...

Mîna palê li ber paleyîyê, xur dikirin, li hev di vegerandin.

Dengê wî şelq li şevreşê dida. Reş pêl bû ji ber dengê wîn. Ji dûr ve, dengê jinekê hat, bû lîle lîle wê. Bi dengê bilind lîliyand. Dûr û dirêj... Jineke din lê vegerand. Bu heydênîya lîle lîle jina. Ji her çar alîyê berîyê deng hat.

Şevreş bû, dengê tiving û lîle lîlê...

Rifat dengê xwe kir:

-Kekê Mihemed, erê min got, dawata birazîyê min li dara.. Şahiya dilî min hara... Birîna dilê min ji kerbê dijminê xedar e... Dengê jina tê bi nale nale... Xurêna tiving û reşşa ne... Ev şeva car zemanê... Ticcar û wext heyf na mînin li erda ne. Sê ehdûemanê xwedê li rihûcanê min ketîbe, min ne hişt kû ev segbav nanê firnê ma bi şikîne.

Jeep qenc û xweş nêzîkayî li wan kir.

Rifat xweş dizanîbû kû yek ber ji ê wîn beletewş na çe. Kekê wîn jî xweş nişancî bû. Kesî kêlik li ber ne dişikand. Çavik, lastîk bi jeepê ve ne man. Dîsa xurt xurta motora wê bû. Her duwan jî nemerdi nekir; fişek li ya din, ajotin ber devê tivingê. Li yek şewtê; paketê tajone xizna tivingê û li duv hev li ser wan vala dikan. Yek ew, yek ê din. Li duv hev. Şer qet ne disekinî. Yekî paket valadikire xiznê, ê din li ser wan didanî, kû ew disekinî, ê din... Ji dengê tivinga kesî hew dengê kesî dikir.

Sekin ne kete wan, heya hemberê wan qenc bê pêjin ne bûn. Kêlikê ew jî man sekini. Ji cihê xwe ne qelikîn. Guh berdane ser wan. Kesê romî bêjî ye, weladê zinê ye; li dayîka xwe ketî ye, êminatî pê nabe; finas û xapê

eskerîyê pîrr hene. Xwe bê pêjin dîkin, kû hemberê wan cî berdan, li wan di reşînîn. Rifat û kekê xwe jîr bûn. Feal û finasê wan dizanîbûn. Xwe kenga di şemirînin.

Rifat tim di got:

-Şemirandin, nîvê mirinê ye. Piştî xwe qet medîna dijmin.

Car din guh berda serdorê xwe. Pêjin jî hemberî wan ne hat. Şartîlek ax avête cem kekê xwe. Kekê wî jî yek avêt cem. Ew îşareta paşketinê bû. Mihemed Seîd li yek xirênê xwe gihand cem têlê. Sekinî... Rifat, xwe xindirand... Sekinî... Car din xwe xindirand... Car din sekinî... Tim bi ser têlê de... Nêzî têlê, dengê xwe kir. Dengê wî mîna torîka derket. Ne kûwîrandin bû, ne wîrandin bû. Dengê xerîb... Ne nas... Qut û kin... Sê cara zimanê xwe di kortîka devê xwe de bir û anî... Bes...

Mihamed Seîd, şartîlek ax avête cem.

Dengê xwe kir:

-Bi vir de... Li dengê min were... Ne rabe...

Rifat sekinî. Guh berda ser jeepê, pêjin tune bû...

Xwe xindirand, li ser hev... Heya bi cem kekê xwe ne sekinî...

Çawa giha cem birayê xwe pirsî:

-Tu bi silametî?

Kekê wî:

-Ji alî min ve erê. Tu çawa yî?

-Ez başim, başim. Xwede li ruwê me nerî.

-Deng qet ji van segbava na ye, çi mesele ye?

-Piştî waqqas fişeka kû mabin sax, ya kûrê mişayixna ne, yan jî bavê wan melkemote.

-Birê min qet tu li dawî na fikirê. Kû ew segbav bê kûştin, em hew dikarin vegerina mala xwe.

-Qet xeyale meke, kes nizanê; benî beşer nizanê kû em di xetê de ne.

-Ëmnatî bi van kesê kû me derbaskirin jî na be.

-Em tişteki ji wan re na bêjin. Ya duduwan; ew heya çar pênc heyve din, na vegerin mala xwe. Heya hinga sed kuçikê din wê bên kevitandin.

-Li binya xetê, dive çend rojekî kes me li gundê dora hidud ne bîne.

-Îşev, qunaxa me Kêlhesenak.

-Îşev!..

-Îşev!... Qet sekin tune ye. Em naçin odê jî, qunax mala Fermano. Bila xeberê bide Ahmedê Hiseyn, bo merivekî rêbîke Bawerdê, mala xezuranê xwe. Çi qewimî be, da xeber bê ji me re.

-Bese, em jî herin îcar.

-Em parîkî din ne sekinin?

-Bo çi?

-Em binerin li dawî...

-Ha wexte hawara wan be.

-Ew jî raste. Hawara wan heye, ya me tune ye.

-Ezê têlê hildim, ti bi çalepkê paşkeve. Haj ji dora xwe û mayîna hebe. Baskî min de were.

Rifat hat kêleka kekê xwe.

Kekê wîn, himmeta xwe berda ser anîşkê xwe û kabokê xwe. Lingê xwe qenc xistin bin têlê; hilda... Tivinga wî jî li ser destê wîn bû. Berê wê da bû jeepê...

Li pêş di nerî.

X X

X

Mihemed Seîd car din li Rifat hilat:

-Parîkî lez bike. Paqê min qurimîn... Hew dikarim têlê ragirim, zû... Tu çi dike ez nizanim? Birayê min, em ne li ber berê paleyîyê ne. Kû, tu, bêhna xwe berdê. Ne wextê rehetîyê ye. Bibure rexê dinî têlê, piştir... Ev hidude... Mînaye kû çavê te li kuştina nehtor e. Zû, ha wexte hawara van segbava bê.

Rifat berepaş bû. Lingê wîn li têlê sekinî. Têl hejyan. Bi zac xwe bi pêş de kişand. Dizanîbû, kû bi ser devera xeter de çu ye. Sekinî, li duv xwe nerî. Di dilê xwe de: "Xebera Kekê Mihemed Seîd e. Parîkî em lez bikin. Çi dibe çi na be!..."

Mihemed Seîd bi hêrz:

-Biner Rifat, weke zaroke meke, tu ne xeşimî, lê tu xwe xeşim dike. Îşev xezebek li ber te ye!... Çi dixwaze nizanim. Mal xerabuna me digêrê, yan na?.. Ti zane kû ev xopana şopikê pîrr teng e. Dora wê jî teva mayin in. Haj ji xwe hebe. Mayîn ne zabitê Tirka ye. Ne romîyê di kozikê de razayî ne. Dijminê hunda ne. Mêranî li hember dijminê hunda na be. Xopana, ne fişekê wan xilas dibin, ne berê wan kor in kû di meriv naliqin. Xofa mirinê jî na keve dilê wan. Kû peqî bê xwîn deng na de. Îşev, xwîn rijîya, bese... Xwîn li erdê na razê. Lez bike, berî hawara wan bê.

Rifat, hew deykir, xwe qenc kişande kêleka kekê xwe.

Bi zik ve, berepaş çu. Dirêjkirî... Ji têtê xelas bû. Rabu, runişt... Tivinga xwe tarmkî danî ser çogê xwe. Îske îsk lê ketibû. Betilî... Ji êvara xwedê ve, hin bez dikir, hin şer... Kûr nefesa xwe da û sitand. Çogê Mihemed Seîd jî qenc qurimîn. Hew dikarîbu têtê ragire. Çiqqas bi wir de di çû, barê têtê giran dibu. Bi zac lingê xwe kişand. Xummên bi têtê ket, hata jêr. Mihemed Seîd jî dehm de rabu, bilez berê xwe da têtê, lingê xwe hilda, bi zac pêl têla kir, têt bi erdê ve miç kirin. Xwe qevaste rexê din. Di gava meşî.

Li duv xwe nerî, Rifat hêj li cihê xwe runiştîbu. Qet ne xema wîn e. Mîna li nava werza runê. Ne bi mino, ne bi teyo...

Mihemed Seîd, bi zirt dengê xwe kir:

-Rabe îcar... Tu çi dike runiştî. Li benda şebeş kû bi cemidê yî, an, li benda zaroka yî, kû ji ter tiroziya bî-nîn. Ez dibêjime te ra be.

Rifat, xwe tewand, destê xwe ber bi kekê xwe dirêj kir.

-Wer, wer!.. Wer bi ner!.. Zû, wer bi ner e!.. Li eceb û tofanê kes ne diya!... Kesî tiştê wisa ne diye... Gîdî!.. Ev çi ecêb e?

Mihemed Seîd bilez hate cem. Runişt...

-Çiye xêr e?... Te çi dît? Kuro, tu ne bîrîndar be, kû îşev tu wilo dike?

Rifat destê xwe ber bi jeepê dirêj kir:

-Na, na, ez ne bîrîndar im. Biner li segbavê Zabît biner e, ecebê dinyayê meyzeke ji xwe re.

Mihemed Seîd, çavên xwe kur kir û nerî.

Zabit bû. Hema, temteletê wî xuya dikir. Yekî dizanîbû kû ewe. Li ser kozikê şipê sekinî bû.

Birîndar bû. Wisa birîndar hat heya bi wir. Çar ber lê ketibun. Çengê xwe yên rastê, bi destê çepê girtibu. Paqa rastê jî li pey xwe di xirxirand. Sê ber li paqa wîn ketibun. Yek jî li çengê wîn. Heya dengê tivinga qenc qut nebû, heya qaçaxçî ne çûn, ji cihê xwe ne lebitî. Dirêjkirî sekinî. Hezrê kû çûn, ji têla derbas bun, ji nu, da xwe... Çengê xwe, paqa xwe qenc girêdan. Bi qarîş u pelasqa... Deng ji şifêrê wîn der ne diket. Dizanîbu, kû şifêrê wîn, weledî zîna ye, bikevê ber himbêza berê metralyozê ewê xwe bi himênê. Kû şer bû, mar bû, di-kete nava axê, hunda dibu, kû qaçaxçî diketin rastê dê, şêr bû. Ji ajotina jeepê jî, dizanîbu. Xwe tawand, heya ket neqeba kursî û bin direksiyon de. Li berîya rast, berê jeepê berda. Wî jî xwe derxist der. Lingê rastê danî ser palika derî jeepê, ji nawqê banî de li der, şer dikir. Bi her sê berê pêşî ne hisîya, heya berê dawî, kû çeng xeliya kete ber, reşaşê ji dest pekî. Ji nû, bi xwe hisîye. Jeep jî, ji hev pîrxulî, bela wela bû, tefîya... Xwe avête erdê. Birîna çengê wîn tenê xedar bû. Hestu zemt kiribu. Her sêkê din, di nava goşt re burî bun. Dawî rabu, xwe sparte jeepê. Nefesa xwe kûr da û sitand. Ber bi kozikê, kulkulî meşî. Ji kuştina her sê romîya di tirsîya. Hat e ser kozikê. Romî ne dîn... Li himmêna wan, çu ser coka avê, li wan nerî. Bi heve girêdayî, mîna sê qurmê dara dirêjî erdê bun. Ma şaş!.. Hêbet girtin. Pîrr cara nav û dengê qaçaxçiyên hêla Torê bi-hîstibu, lê ne bi vê temtêletê, ne bi vê ecebê. Roja kû lingê wîn kete Nisêbinê, ji xwer sunda asê û mezin xwar, kû qet ferezendê ne de qaçaxçiyên. Yek nokte bi tenê jî, bo wan ne hêlê seranser. Dil xwe de, wî bibe

têba... Xofa zikê kesên qaçaxçî... Têba zirav qetandinê... Têba şevreşkê... Salekê kû mîna têba, şevreşkê de, di ber hidud re, qet atlayî ne da benibeşer. Li pîrr ciwamêra qewimand, pîr kurebav di nava xwîna sor de gevizandin, pîrr malê xelkê ji wan sitand, pîrr heywan ji ber hidud dan hev. Berê pîrr kesan da nava mayin a. Perçe perçe kirin. Pîrr kes di nava şuvên berîya binya Bagokê, bi jeepê, mîna çêlkewa girtin. Mîna kewên silikandî, di rastê de... Kesî, hew diwêrabû di wan aqlîma re here binya xetê. Îşev, ew tiştên jêre dihatin gotin, kû di bihîst, bi çavên serê xwe dîtîn. Tiştên kirî teva di firnikê wîn re derketin. Di ser serê romîyan re sekinî. Serê xwe hejand, bi dengê bilind sixef kirin. Sixêf dikir romî yan, dikir qaçaxçî yan... Tiştê di hata ber devê wîn di hejmart. Ji aş û bajar dida hev; ji hikumeta li Enqera bigire heya bi qeymeqamê Nisêbînê... Ji qolordîya Diyarbêkrê, heya bi ya Bawerdê... Dan ber hev û sixêfa... Ne diya generalan hişt, ne bav û xwişkê wan... Bi destê sexlem jî, li romîyan di xebitî bo wan ji hev veke. Car cara pihîn li wan didan. Kulm û şeqam di wan diwerkir.

Kirkura diduwan ji wan bû.

Heya kû zabit hat ser wan. Qet dengê wan der ne diket. Bê hiska, di nava xwe de, fişkefişk li wan diket. Car cara, ê sisîyan, dengê xwe, hêdîka li wan di kir, yan, kabokê xwe li wan didan, bi wan de di xeyîdî, fêde ne dikir. Çavê tirsê bû, xofa mirinê ketibû zikê wan. Hew dikarîbune xwe. Nav di xwe didan, di nava xwe de zirt dikirin, fêde ne dikir. Sehwa giran, toza mirinê dabu ser wan... Zirt û nav têdan xêr ne dikir.

Kû Zabit hat, dengê xwe kir, nas kirin, kûrên bi her duwan ket. Bi hev re, sewta xwe berdan. Mîna zaroka

memik ji devê wan derkevê... Bu fişfiş û hîrîqîhîrîqa wan. Ê din, qet ne xema wîn bû. Dev û lêvê wîn werimî bûn. Mîna hebanê... Çawa dest û lingê wîn vebun, li xwe da, li Zabit jî ne sekîni, çû, dera kû tivingê wan avêtbunê de. Destê xwe paland, serdorên xwe mişmişand; li wandera teva gerîya, tiving dîtîn, rahişta ya xwe, avêtê milê xwe, her duwê din jî anîn, danîn ber kozikê. Bibez çû cem Zabit. Zabit ber bi têlê di çû. Wîn jî da ber re... Qet deng ne kir. Ne got ay, ne got dinanê min şikandin, ne got, dev û lêvê min çirîyan, ji hev de ketin e. Qet!.. Di ber Zabit re, di meşî.

Her duwê din, ji coka avê derneketin. Qet... Di cihê xwe de man şilayî... Çawa ketibun, çawa hatibune girêdan, wisa sekînin. Bi ser hev de hêrivtî... Ling û çengê wan tevîzî bun. Rewa mêranîyê di wan ne gerîya. Heya kû, şifêrê jeepê hat cem wan.

Şifêr, mîna xwîzik bû.

Ew jî, bîrîndar bû. Lê ne bixem... Berê pêşî, kepa wîn, tevî pora wîn heya bi stîrîyên nava serê wîn, xet da bû. Bêhnikêkê gêj bû, car din hate hişê xwe. Berê duduwan, guhê wîn ê çepê revand. Guhê wîn, mîna ê rovî bel bûn.

Çawa giha cem wan, mîna bela li wan qewimand.

-Rabin kuro, rabin. Hun ji kera ne, hey gîdîn kurê kera... Dewar kurê dewaran, rabin li tivingê xwe bi pirsîn. Kû tivingê we hunda bin, Zabit wê kûtê zîlika dayik û xwişkê we de. Qaçaxçî ya hun ne kuştin, lê Zabit wê we bikujê. Hun bê derb mirin, lawo rabin... Rabin eşek kurê eşeke...

Rahişte çengê wan, bi zac zerî nava şuvê kirin.

Rifat da xwe...

Bi sixefa pêşî re, berê tivingê da yê; Mihemed Seîd xwe zer kire devê tivingê. Ne hişt.

-Xwedê ji te sitandî ye. Karê me xelas, bi silametî derbas bu, eva din çîye îcar. Tu ji evda fedî nake, ma ti, ji Xwedê jî na tirse... Bila xofa xwedê bikeve dilê te. Ra be îcar, bi de duv min. Heyran, gîdî!... Îcar, em ne bun qaçaxçî, em bun nijdevan û mêrê ser kemîn û kozikan...

Bi çengê wîn girt û kişand.

Rifat, di ber xwe de got:

-Tu bi serê xwe bike, parîkî din bi sekine. Em binerin bê ev segbav wê çî bike?

Mihemed Seîd bi hêrz:

-Wê çî bike, xwedê ji dayîka her sê romî yan sitand.

Rifat destê xwe ber bi zabit dirêj kir:

-Biner, biner ber bi me tê.

Mihemed Seîd bersiva wîn ne da.

Çengê wîn şidand û kişand ber bi xwe. Li duv xwe kiş-kışand. Heya bi rexê din î têlê ne sekinî. Kû têl derbas kirin çengê wîn berda.

-Îcar rune, heya sibehî.

Xebera Mihemed Seîd di devê wîn de, car din dengê Zabit hat. Li ber têlê bû. Ha, ha, xeber dikirin. Car cara sixêf dikirin xwe jî. Dîya xwe, bavê xwe, xwişka xwe di da ber xebera. Erd û azman, ax û xwelî, kevir û lat, dar û devî li nava hev dixist.

Kû giha ber têlê, dengê xwe qenc bilind kir:

-Vê carê wê kuta dayîka min de, heya carek din. Heya carek din, heya carek din!...

Mihemed Seîd bi qahr:

-Ev segbav belakê di xwazê...

Rifat di ber xwe de beşî:

-Erê lawo, bavê te, mînaya parîk nan da ye feqîrna, heya kû ti ji vê fisdumanê xelas buyî. Wele, min tamar li serê te rakir, min ti kuştî, lê Xwedê ti ne kuştî. Başa, heya car din... Mîna ye, hêjî, tîrrê te ne bu ne fiss... Car din lawê tîrrê, car din... Sabrê bi de xwe, her cem doktor û hekîma, da bîrînê te rehet bike, paşê.

Eyub, bendeyî wan bû.

Li ber têlê runîştî bû. Di nava koma însana de, kes di hejmartin, nû, hejmar xelas kiri, dengê derekên Ereba kete guhê wîn de. Rêwîngî teva xistin qeraxê bestê de, dirêjî erdê kirin, ew hata ber hidud. Demançe, fişek di devê wê de, tazî, di destê wîn de...

Çawa apê wîn û bavê wîn gihane cem, ber bi wan qevist. Hê wan xeber ne dayî, li wan û silametiya wan jî ne pirsî. Ji cih: Destê xwe, ber bi Gundikê Nezîr ve dirêj kir.

-Derekê Gundik, li dengê tivinga derketin.

Rifat:

-Esseh tu zanî kû derek bûn?

-Dengê wan xweş dihat min.

-Te ne dîn?

-Na, li gor dengê wan, nêzîk in.

-Te ji wan fam kir?

-Çawa Apo, ez erebî xweş dizanim, tu jî dizane. Wan xweş xweş ne wêrabun, ber bi têlê bên. Dure dur di-man. Hê jî li wir in...

-Mîna, mar in, li ber virra veketîne. Kû Qaçaxçî derbasî vî rexî bun, di çine wan. Segbavê pîs...

Mihemed Seîd, di ber xwe de:

-Em ji fisdumanekê xelas bun, îcar, dora yek din e.

Rifat hêdîka:

-Xem na ke. Yan dive kû em, bêhnikêkê bi sekinin, yan jî, dive, em ber bi jêr, alî Mizgeftê de herin.

Mihemed Seîd:

-Xezeb, xezebê dibarîne!...

Ev gotin bo Rifat bû.

Rifat jî fam kir. Deng ne kir.

Li Eyub hilat:

-Birazî, her wan ciwamêra bide duv xwe, best û best xwe berdin.

Mihemed Seîd jî ra bû.

-Ez jî herim. Eyub vandra qet nas nake. Dive, em bi sitar herin. Şerek li hêla Cerihê çê bibe, xilasiya me tune. Ne em dikarin vegerin hêla Torê, ne em dikarin ber bi çolê herin. Hidudekî din jî tune ye, kû em bidin şun xwe de; bo, têl û mayin bikevin navbera me û derekan de. Car cara, têlê bi dirih û mayin jî, bo mihov dibine sitar. Ya Hu, sitar ji ba te...

Mihemed Seîd, da pêşî ya Eyub.

Hin di meşî hin di got:

-Lawê min, apê te îşev xezep di xwest. Xezeba xwedê!... Em, îcar ne bun qaçaxçî, em bun, ê ser kozik û kemîn a. Me tîrî xwar, apê te, divabu kû, nahtor jî bikuje.

Merovên qaçaxçî mîna diz e. Bi sitar, bi dizî karê xwe dike. Bo vê sedemê, bi şev, nivê şevê, di nava reşa êvarî de, li hiduda dixê. Qaçaxçî, bo abora dinyayî kar dike. Ne ji xweşîya xwe li nava agir dixê. Ji mecburî... Ji ne çarî... Mîna van ciwamêrê îşev bi mere, bo çar, pênc heyvên havînî xwe li nava agir dixin. Bo, debora xwe û zarokên xwe... Rifatê me, li dora hidud, li heyfa bav û kala digêrê.. Erêêê, erêêê!... Lawê min!... Apê te, dizê bi zengil e. Wilo çê na be? Kesî, di dem û dewrana de ne diye, kû qaçaxçî, berbendî, romî û zabita sekinîne, da şer bikin. Kû biya min kirba ye, niha ji mêj em li qunaxa xwe bun. Ne dengê sixêfê bêjîyê zabitê Tirka di hat guhê me, ne derekê Erebe çaq rut liqasî me dibun.

Sekinî.

Çend gavê din avêtin, car din xeber da.

Lê kin birî.

-Xezeb, xezebê dibarîne!... Çi hevce ye birayê min?

bo xwendevane:

ziman,
ne bes bi nivîsandina pirtukan
tê xilmetkirin
û pêş de diçe.
Xwendin
û rexne jê re dive.
Xwendin û rexne,
ne li hunermenda tenê ye;
kesên xwendevan, gere vî barî,
hinekî
li ser milê xwe bike.

Medenî Ferho

Bruksel: 02. 06. 1993

DENGÊ GEL

**Dengê gel
bilind
û
bi kîn e**

**Çermê wî
tev birîn e
kêr e
xencer e
û şûr e**

**Fîşeka Newrozê ye
li ser dilê wî
jînê
kezeb parçe kirî ye**

**evîna reben/
derwêş m. ferho**

helbest

Nêzîk wê çap bibe

.....

Pınarın yeryüzü ne kadar sakındır. Medeni'nin yüzü, içindeki kavgayı gizliyor. Şiirleri, pınarın hem gölgesini, hem de ceviz yaprakları arasından gözüküp güneşini vortyor.

Doğu'lu. Birçok anlamda ve bir has anlamda Doğu'lu. Acem asıllı, Anadolu'da yerleşik, kendine Roma'lı adını layık görmüş, Mevlana Romalı'nın insana mı, Tanrı'ya mı; somut mu, soyut mu? Söylemek imkansız; ayrıca, ayırmak gereksiz. Medeni'nin şiirsel özleminde de kâdın ile mücadele, sık sık birbirini kucaklıyor ve arıyor.

Mevlana değil Yunus türü daha dar bir sözlük kullanıyor. Tekrarı seviyor. Tekrar yöntemi ile sıkışmış seviyi büyltmesini haykırıyor. Çağlıyor ve haykırıyor ve her çağlama ile haykırma olduđu gibi, şiiri değişik güzellik derecelerine saçıyor.

.....

Yalçın Küçük
Önsöz

*mapusluk gerçeğim/
medeni ferho*

mirin na be xelat/
medeni ferho
helbest
Nêzik wê çap bibe

EZ ZERDEŞTÎME

*Ez Zerdeştîme lo bavo ne agir perestim
Min berê xwe dida rojê lê agir ez di parêstim
Zerdeşt digot kû xwedê yeke ez jêre dilxwestim
Dawî gotîye ez insanê xaliq ê bi xwe destim*

*Berî Tewrat û Zebur û Êncîl û Kur'an-ê
Zerdeşt got xwedê erd danî bin stuna azman-î
Dawî sitêrik danîn bi xilmeta şewq û cemal-î
Xwedê nîşan dayîye li bajar ê Kurda Hemedan-ê*

*Lo kuro Êzîdxanî bi xêr û hesenat-in
Xwedî desmala heft rengî ya kesrewat-in
Pîr û qawalên wa bi limêj û salat-in
Gelê serketî bi edep û rêz û xelat-in*

CIGERXWÎN

DERWÊŞ M. FERHO

**POEZIE
UIT
KOERDISTAN**

Tigris

Derwêş M. Ferho

**Dengê
ROJA DÎL**

Helbest

TIGRIS

DILO CAN

*Ew serhildana bi rumet
Li dijmin dike sed zahmet
Li welat dike sed rehmet
Bijî bijî dilo can*


*Ew kesê rajê çekên xwe
Biçî di hawara gelên xwe
Bikevê rafê hevalên xwe
Bijî bijî dilo can*

*Şerê bi nav û pesindar
Mîna kalê Kawa ê hesinker
Li dijmin dike zora dar
Bijî bijî dilo can*

dilo can / medenî ferho

helbest

Nêzik wê çap bibe



Sal 1947, li hêla Torê,
li gundê Mizîzexê hatim
dinê. Mamostayî ya heft sala,
heşt cara sirgunî bi xwer anî.
Û mahkeme...
12 Adarê hatim girtin.
1973, li Stembolê,
bum rojnamevan...
Weşanxane ABeCe vekir.
12 Êlunê hatim girtin.
Heya 1987 domand...
Zor û zahmetî û perçiqandin,
nayê hed û hesêba. Cih û war...
Mal û mewdan pîrr hat talankirin.
Qet, ji hêvîtiya serfirazîya gelên xwe
ji doza gelên xwe dur ne ketim.
Îro jî, bi dijwariya hewngîrî û dil
berdewam e.